# KURDÎ

# 6

## Kurmancî

**NIVÎSKAR**

Prof. Dr. Kadri Yıldırım
Yrd. Doç. Dr. Abdurrahman Adak
Yrd. Doç. Dr. Hayrullah Acar
Yrd. Doç. Dr. Tahirhan Aydın
Öğr. Gör. İbrahim Bingöl
Öğr. Gör. Ramazan Pertev
Öğr. Gör. Ramazan Çeçen
Öğr. Gör. Mikail Bülbül
Öğr. Gör. Zülküf Ergün



**EDİTÖR**
Prof. Dr. Kadri YILDIRIM

**PROGRAM GELİŞTİRME**
Yrd. Doç. Dr. M. Cevat YILDIRIM
Yrd. Doç. Dr. Akif AKTO
Yrd. Doç. Dr. Nurettin BELTEKİN
Öğr. Gör. Faysal ÖZDAŞ
Öğr. Gör. Ömer Murat ÖTER

**REHBERLİK UZMANI**
Öğr. Gör. Ramazan PERTEV

**ÖLÇME DEĞERLENDİRME**
Yrd. Doç. Dr. Abdurrahman EKİNCİ



# İSTİKLÂL MARŞI

Korkma, sönmez bu şafaklarda yüzen al sancak;
Sönmeden yurdumun üstünde tüten en son ocak.
O benim milletimin yıldızıdır, parlayacak;
O benimdir, o benim milletimindir ancak.

Çatma, kurban olayım, çehreni ey nazlı hilâl!
Kahraman ırkıma bir gül! Ne bu şiddet, bu celâl?
Sana olmaz dökülen kanlarımız sonra helâl...
Hakkıdır, Hakk'a tapan, milletimin istiklâl!

Ben ezelden beridir hür yaşadım, hür yaşarım.
Hangi çılgın bana zincir vuracakmış? Şaşarım!
Kükremiş sel gibiyim, bendimi çiğner, aşarım.
Yırtarım dağları, enginlere sığmam, taşarım.

Garbın âfâkını sarmışsa çelik zırhlı duvar,
Benim iman dolu göğsüm gibi serhaddim var.
Ulusun, korkma! Nasıl böyle bir imanı boğar,
"Medeniyet!" dediğin tek dişi kalmış canavar?

Arkadaş! Yurduma alçakları uğratma, sakın.
Siper et gövdeni, dursun bu hayâsızca akın.
Doğacaktır sana va'dettiği günler Hakk'ın...
Kim bilir, belki yarın, belki yarından da yakın.

Bastığın yerleri "toprak!" diyerek geçme, tanı:
Düşün altındaki binlerce kefensiz yatanı.
Sen şehit oğlusun, incitme, yazıktır, atanı:
Verme, dünyaları alsan da, bu cennet vatanı.

Kim bu cennet vatanın uğruna olmaz ki fedâ?
Şühedâ fışkıracak toprağı sıksan, şühedâ!
Cânı, cânânı, bütün varımı alsın da Huda,
Etmesin tek vatanımdan beni dünyada cüdâ.

Ruhumun senden, İlâhi, şudur ancak emeli:
Değmesin mabedimin göğsüne nâmahrem eli.
Bu ezanlar-ki şahadetleri dinin temeli-
Ebedî yurdumun üstünde benim inlemeli.

O zaman vecd ile bin secde eder -varsa- taşım,
Her cerîhamdan, İlâhi, boşanıp kanlı yaşım,
Fışkırır ruh-ı mücerred gibi yerden na'şım;
O zaman yükselerek arşa değer belki başım.

Dalgalan sen de şafaklar gibi ey şanlı hilâl!
Olsun artık dökülen kanlarımın hepsi helâl.
Ebediyen sana yok, ırkıma yok izmihlâl:
Hakkıdır, hür yaşamış, bayrağımın hürriyet;
Hakkıdır, Hakk'a tapan, milletimin istiklâl!


Mehmet Âkif ERSOY

# ATATÜRK'ÜN
# GENÇLİĞE HİTABESİ

Ey Türk gençliği! Birinci vazifen, Türk istiklâlini, Türk cumhuriyetini, ilelebet, muhafaza ve müdafaa etmektir.

Mevcudiyetinin ve istikbalinin yegâne temeli budur. Bu temel, senin, en kıymetli hazinendir. İstikbalde dahi, seni, bu hazineden, mahrum etmek isteyecek, dahilî ve haricî, bedhahların olacaktır. Bir gün, istiklâl ve cumhuriyeti müdafaa mecburiyetine düşersen, vazifeye atılmak için, içinde bulunacağın vaziyetin imkân ve şeraitini düşünmeyeceksin! Bu imkân ve şerait, çok nâmüsait bir mahiyette tezahür edebilir. İstiklâl ve cumhuriyetine kastedecek düşmanlar, bütün dünyada emsali görülmemiş bir galibiyetin mümessili olabilirler. Cebren ve hile ile aziz vatanın, bütün kaleleri zapt edilmiş, bütün tersanelerine girilmiş, bütün orduları dağıtılmış ve memleketin her köşesi bilfiil işgal edilmiş olabilir. Bütün bu şeraitten daha elîm ve daha vahim olmak üzere, memleketin dahilinde, iktidara sahip olanlar gaflet ve dalâlet ve hattâ hıyanet içinde bulunabilirler. Hattâ bu iktidar sahipleri şahsî menfaatlerini, müstevlilerin siyasî emelleriyle tevhit edebilirler. Millet, fakr u zaruret içinde harap ve bîtap düşmüş olabilir.

Ey Türk istikbalinin evlâdı! İşte, bu ahval ve şerait içinde dahi, vazifen; Türk istiklâl ve cumhuriyetini kurtarmaktır! Muhtaç olduğun kudret, damarlarındaki asîl kanda, mevcuttur!



MUSTAFA KEMAL  ATATÜRK

# NAVEROK


Unîteya 1. XWENDINGEHA MIN 09-24

Unîteya 2. JÎNGEHA MIN 25-38

Unîteya 3. LAŞ Û TENDURISTÎ 39-52


Unîteya 4. DEMSAL Û SALNAME 53-70


Unîteya 5. XWARIN Û VEXWARINÊN ME 71-84

Unîteya 6. HATÛÇÛ-GEŞTÛGER 85-98

Unîteya 7. ÇALAKIYÊN SERBEST 99-104

FERHENGOK 115







# UNÎTEYA

1.

## XWENDINGEHA MIN

***Her çûk bi zimanê xwe dixwîne.***

**Gotina Pêşiyan**

**BEŞA 1.**
Dema xwendin û guhdarîkirinê



# Rêzikên xwendingehê

Mamoste derheqê rêzikên xwendingehê de ji xwendekaran dipirse û ew jî bersiva wî didin.

**Mamoste** : Gelo her yek ji we dikare behsa rêzikeke xwendingehê bike?
**Serdar** : Ez bê destûra mamoste naaxivim.
**Ehmed** : Ez di polê de nabezim.
**Zeyneb** : Ez pola xwe qirêj nakim.
**Ronahî** : Ez di wexta xwe de têm xwendingehê.
**Rizgar** : Ez di wexta xwe de dikevim dersê.
**Dilber** : Dema ku ez pirsgirêkekê dibînim, ez mamoste jê haydar dikim.
**Zelal** : Ez qirşûqalan navêjim derdora xwe.
**Baran** : Ez kelûpelên hevalên xwe bê destûr bi kar naynim.
**Rêzan** : Dema ku hevalên min biaxivin ez li wan guhdarî dikim.
**Fatîme** : Dema ku mamoste dersê dide ez gotina wî nabirim.
**Kerem** : Ez kelûpelên polê bi baldarî bi kar tînim.
**Bawer** : Ez jî hemû rêzikên xwendingehê bi cih tînim.

**BEŞA 2.**
Dema xwendinê

## Li gorî agahiyên jorîn, rêzik û navan hevyek bikin.


| | |
|---|---|
| **1.** Bê destûra mamoste naaxive. | Zeyneb |
| **2.** Di polê de nabeze. | Dilber |
| **3.** Pola xwe qirêj nake. | Ehmed |
| **4.** Di wexta xwe de dikeve dersê. | Ronahî |
| **5.** Dema ku pirsgirêkekê dibîne, mamoste jê haydar dike. | Serdar |
| **6.** Di wexta xwe de tê xwendingehê. | Rizgar |



**BEŞA 3.**
Dema xwendinê

## Li gorî agahiyên jorîn li hemberî hevokên jêrîn nîşaneya “R” (rast) an “Ç”yê (çewt) daynin.

**1.** Dema mamoste dersê vedibêje Baran axaftina wî dibire. ( )
**2.** Dema hevalên Rêzan diaxivin, ew li wan guhdarî dike. ( )
**3.** Bawer hemû rêzikên polê pêk tîne. ( )
**4.** Zelal qirşûqalan davêje derdora xwe. ( )
**5.** Fatîme kelûpelên hevalên xwe bê destûr bi kar nayne. ( )
**6.** Kerem kelûpelên polê bi baldarî bi kar tîne. ( )



**BEŞA 4.**
Dema nivîsînê

## Bi bêjeyên tevlihev ên jêrîn, hevokên sererast çê bikin û binivîsin.

1. nabezim / de / Ez / polê / di

.......................................................................................................

2. pola / Ez / qirêj / xwe / nakim

.......................................................................................................

3. dikevim / di / dersê / wexta / Ez / xwe de

.......................................................................................................

4. xwendingehê / di / de / Ez / têm / wexta xwe

.......................................................................................................

5. derdora / navêjim / qirşûqalan / xwe / Ez

.......................................................................................................

6. Ez / polê / bi kar tînim / bi baldarî / kelûpelên

.......................................................................................................



**BEŞA 5.**
Dema axaftin û nivîsînê

## Pirsên jêrîn bi "erê" yan jî "na"yê bibersivînin.

1. Gelo tu bê destûra mamoste diaxivî? ..................................
2. Gelo tu qirşûqalan davêjî derdora xwe? ..................................
3. Gelo tu di wexta xwe de têyî xwendingehê? ..................................
4. Gelo tu pola xwe qirêj dikî? ..................................
5. Gelo tu kelûpelên polê bi baldarî bi kar tînî? ..................................
6. Gelo tu bê destûr, kelûpelên hevalên xwe bi kar tînî? ..................................



**BEŞA 6.**
Dema xwendinê











## Li gorî agahiyên jorîn pirsên jêrîn bibersivînin.

**1.** Kî bê destûr kelûpelên hevalên xwe bi kar nayne?
a) Baran b) Ronahî c) Zelal

**2.** Kî kelûpelên polê bi baldarî bi kar tîne?
a) Ehmed b) Rizgar c) Kerem

**3.** Dema pirsgirêkekê dibîne kî mamoste jê haydar dike?
a) Dilber b) Ronahî c) Serdar

**4.** Kî di polan de nabeze?
a) Ehmed b) Rêzan c) Bawer

**5.** Dema mamoste dersê vedibêje kî axaftina wî nabire?
a) Baran b) Fatîme c) Ronahî

**6.** Kî di wexta xwe de dikeve dersê?
a) Kerem b) Fatîme c) Rizgar



**BEŞA 7.**
Dema axaftin û nivîsînê

## Hûn jî şeş rêzikên xwendingehê bibêjin û binivîsin.

**1.** ..........................................................................................................

**2.** ..........................................................................................................

**3.** ..........................................................................................................

**4.** ..........................................................................................................

**5.** ..........................................................................................................


**6.** ..........................................................................................................



BEŞA 8.
Dema xwendin û guhdarîkirinê




# Kelûpelên polê diaxivin




**Derî:** Merheba, ez derî me. Ez ji we dixwazim ku hûn min hêdî bigirin.

**Mase:** Ez jî mase me. Dema ku hûn min bi kar tînin ser min xêz nekin. Lewra ez gelekî xemgîn dibim.




**Çopdank:** Navê min çopdank e. Eger hûn çopên xwe bavêjin hundirê min, ez dê kêfxweş bibim.

**Pace:** Navê min jî pace ye. Ku hûn min paqij bigirin, dê pola we bêtir ronî bibe.



**Texte:** Navê min jî texte ye. Ez ji bo nivîsên we amade me. Dema karê we qediya, hûn min paqij bikin ez dê kêfxweş bibim.



**Lambe:** Ez jî lambe me. Ez polê ronî dikim. Dema hewce nebe hûn min vemirînin ez dê kêfxweş bibim.

**Rûniştek:** Ji min re dibêjin rûniştek. Eger hûn min bişikînin hûn dê dersa xwe li ser lingan guhdarî bikin.




**Jêbir:** Navê min jêbir e. Texte bi min paqij dibe.

**Pênûsa texte:** Ez pênûs im. Ez nebim hûn nikarin hevokên xwe li ser texte binivîsin.

**Refa pirtûkan:** Ez refa pirtûkan im. Hûn çiqas bixwazin ez dê ewqas pirtûk bidim we.









**BEŞA 9.**
Dema xwendinê

## Kîjan hevoka jêrîn ji aliyê kîjan kelûpelê ve hatiye gotin.

**1.** “Hûn çiqas bixwazin ez dê ewqas pirtûkan bidim we.”
a) Pace b) Rûniştek c) Refa pirtûkan


**2.** “Hûn çopên xwe bavêjin hundirê min ez dê kêfxweş bibim.”
a) Çopdank b) Lambe c) Jêbir

**3.** “Ez ji we dixwazim ku hûn min hêdî bigirin.”
a) Pênûsa texte b) Rûniştek c) Derî

**4.** “Dema hewce nebe hûn min vemirînin ez dê kêfxweş bibim.”
a) Pace b) Lambe c) Texte

**5.** “Texte bi min paqij dibe.”
a) Jêbir b) Mase c) Lambe

**6.** “Eger hûn min bişikînin hûn dê dersa xwe li ser lingan guhdarî bikin.”
a) Pace b) Rûniştek c) Pênûsa texte





**BEŞA 10.**
Dema nivîsînê

## Li gorî wêneyên jêrîn, navên kelûpelan bibêjin û binivîsin:



Ç....................


D....................



J....................


L....................


M....................


P....................


R....................


R....................


P....................


T....................



**BEŞA 11.**
Dema axaftin û nivîsînê

## Hûn jî derheqê kelûpelên jêrîn de hevokeke nû binivîsin.

**Pênûsa texte** : ..............................................................................


**Lambe** : ..............................................................................

**Çopdank** : ..............................................................................

**Derî** : ..............................................................................

**Rûniştek** : ..............................................................................

**Pace** : ..............................................................................





**BEŞA 12.**
Dema axaftin û nivîsînê

## Hûn jî navên şeş kelûpelên xwendingehê bibêjin û binivîsin.


**1.** .................................
**2.** .................................
**3.** .................................
**4.** .................................
**5.** .................................
**6.** .................................



**BEŞA 13.**
Dema xwendin û guhdarîkirinê

## Hevokên kêm ên jêrîn bi agahiyên hemberî wan re hevyek bikin.

| | |
|---|---|
| **1. Derî:** Ez ji we dixwazim ku | *ronî dikim.* |
| **2. Çopdank:** Eger hûn çopên xwe bavêjin hundirê min | *paqij dibe.* |
| **3. Texte:** Ez ji bo nivîsên we | *pola we dê bêtir ronî bibe.* |
| **4. Jêbir:** Texte bi min | *ez dê kêfxweş bibim.* |
| **5. Lambe:** Ez polê | *amade me.* |
| **6. Pace:** Ku hûn min paqij bigirin, | *hûn min hêdî bigirin.* |



**BEŞA 14.**
Dema lîstikê

## Mamik

Şevê bûk e,
Rojê pepûk e.


*(Çira, lambe)*



Mela ye, mela nîne,
Aqildar e, ruh tê de nîne.

*(Pirtûk)*





**BEŞA 15.**
Dema lîstikê

# Xaçepirs

| | | | | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| T | E | **Ç** | O | K | M | N | R | H | G | F | D | S | A |
| E | Y | **O** | J | K | L | Ş | Û | P | F | G | H | G | L |
| X | F | **P** | W | E | R | T | N | U | J | D | F | G | A |
| T | V | **D** | E | R | Î | Y | I | E | K | L | Ş | P | M |
| E | B | **A** | A | S | D | R | Ş | T | T | G | H | J | B |
| E | N | **N** | B | N | M | W | T | F | O | P | A | C | E |
| F | M | **K** | N | M | A | S | E | H | L | Ş | Z | X | V |
| A | A | S | T | Y | U | I | K | R | F | G | H | J | U |
| R | P | Ê | N | Û | S | A | T | E | X | T | E | Y | Ê |
| R | E | F | A | P | I | R | T | Û | K | A | N | Z | X |
| L | J | G | I | M | J | F | F | J | Ê | B | I | R | C |

**DERÎ
MASE
ÇOPDANK**

**PACE
TEXTE
LAMBE
RÛNIŞTEK**

**JÊBIR
PÊNÛSA TEXTE
REFA PIRTÛKAN**



BEŞA 16.
Dema xwendin û guhdarîkirinê



# Dîlan û Mîrza

Dîlan û Mîrza li baxçeyê xwendingehê rûniştine û diaxivin. Dîlan dixwaze Mîrza binase û Mîrza jî dixwaze wê binase. Her du heval, xwe bi hev didin nasîn:

“Navê min Dîlan e. Ez diwazdeh salî me. Ez di pola 6Ayê de dixwînim. Bavê min ji Wanê û diya min ji Agiriyê ye. Du birayên min hene. Navê yekî Kenan û yê din Mirad e. Xwişkeke min jî heye, navê wê Zeyno ye. Ez bejindirêj im. Porê min reş e û çavên min qehweyî ne. Ez ji rengê sor bêtir hez dikim. Di demên xwe yên serbest de, ez ji çêkirina wêneyan û ji xwendina pirtûkan gelekî hez dikim. Ez hemû ajelan diparêzim û ji pisîkan jî gelekî hez dikim. Jûra min gelekî bi rêkûpêk e. Ji bo ku kesekî aciz nekim, bi dengekî nizm li muzîkê guhdarî dikim. Zû radikevim û zû şiyar

dibim. Ji xwendingeh, mamoste û hevalên xwe gelekî hez dikim. Di betlaneyê de hem bîna xwe didim û hem jî li dersên xwe dixebitim. Xwarinên ku diya min çê dike ez nabijêrim, çi çê bike ez dixwim.”

Piştî Dîlanê, Mîrza dest pê dike:

“Navê min Mîrza ye. Ez jî diwazdeh salî me. Di pola 6Byê de dixwînim. Dê û bavê min ji Colemêrgê ne. Birayek û du xwişkên min hene. Navê birayê min Rêzan e û navên xwişkên min Binevş û Gulistan in. Porê min zer e û çavên min şîn in. Ez herî zêde ji rengê porteqalî hez dikim. Ez ji xwendina pirtûkan û guhdarîkirina stranan jî gelekî hez dikim. Di nav ajelan de ji hespan hez dikim. Jûra min jî gelekî bi rêkûpêk e. Di demên xwe yên serbest de ez digel hevalên xwe futbol û kişikê dilîzim. Ez van tiştan li rojnivîska xwe dinivîsim.”

Dîlanê ji Mîrza re got: “Ez bi nasîna te gelekî kêfxweş bûm.”

Mîrza jî got: “Ez jî...”

**BEŞA 17.**
Dema nivîsînê

## Li gorî agahiyên jorîn li hemberî hevokan “Dîlan” an jî “Mîrza” binivîsin.

1. Ez di pola 6Ayê de dixwînim. ……………………..
2. Ez di pola 6Byê de dixwînim. ……………………..
3. Ez bejindirêj im. ……………………..
4. Dê û bavê min ji Colemêrgê ne. ……………………..
5. Ez di nav ajelan de ji hespan hez dikim. ……………………..
6. Ez zû radikevim û zû şiyar dibim. ……………………..

**BEŞA 18.**
Dema nivîsînê

## Ji bo hevokên jêrîn pirsan binivîsin.

**1.** ..........................................................................................................?
Ez van tiştan li rojnivîska xwe dinivîsim.
**2.** ..........................................................................................................?
Ez ji rengê sor hez dikim.
**3.** ..........................................................................................................?
Ez di pola 6Byê de dixwînim.
**4.** ..........................................................................................................?
Navê min Zeyno ye.
**5.** ..........................................................................................................?
Du birayên min hene.
**6.** ..........................................................................................................?
Navê birayê min Rêzan e.

**BEŞA 19.**
Dema xwendinê

## Li gorî agahiyên jorîn bersiva pirsên jêrîn bibînin.




**1.** Bavê Dîlanê ji ku ye?
a) Wan b) Agirî c) Colemêrg
**2.** Mîrza ji kîjan ajelî hez dike?
a) Pisîk b) Hesp c) Çêlek
**3.** Porê Dîlanê çi reng e?
a) Qehweyî b) Reş c) Zer
**4.** Çavên Mîrza çi reng in?
a) Şîn b) Qehweyî c) Reş
**5.** Mîrza çi dinivîse?
a) Name b) Sipartek c) Rojnivîsk
**6.** Kîjan ne navê birayê Dîlanê ye?
a) Rêzan b) Kenan c) Mirad



**BEŞA 20.**
Dema xwendinê

## Hevokên kêm ên jêrîn bi agahiyên hemberî wan re hevyek bikin.

| | |
|---|---|
| **1.** Dîlan û Mîrza li baxçeyê xwendingehê | *şiyar dibim.* |
| **2.** Di demên xwe yên serbest de, ez ji çêkirina wêneyan | *bi rêkûpêk e.* |
| **3.** Ez hemû ajelan | *guhdarî dikim.* |
| **4.** Jûra min gelekî | *diparêzim.* |
| **5.** Ez bi dengekî nizm li muzîkê | *rûniştine.* |
| **6.** Ez zû radikevim û zû | *hez dikim.* |



**BEŞA 21.**
Dema nivîsînê

## Hûn jî xwe bidin nasîn.







# UNÎTEYA

## 2.

## JÎNGEHA MIN

***Hezar carî bipîve, carekê bibire.***

**Gotina Pêşiyan**



BEŞA 1.
Dema xwendin û guhdarîkirinê



## Xaniyê Derwêş

Ev xaniyê Derwêş e, Derwêş li gund dijî. Navê xanima Derwêş, Xecê ye. Xecê jineke rind û jêhatî ye. Sê zarokên Derwêş û Xecê hene. Navê keça wan Eslîxan e. Navê kurê wan ê mezin Serdar û yê piçûk jî Ronî ye. Xaniyê Derwêş yekqatî ye. Deriyek û pênc paceyên xanî hene. Xanî ji sê jûran û hol, pêjgeh, daşir û serşokekê pêk tê. Li dora xaniyê wan baxçeyekî mezin heye. Li hemberî xanî hespek bi darekê ve girêdayî ye. Ew, hespê Serdar e. Serdar ji hespan gelekî hez dike. Navê hespê wî, Rewan e. Niha Serdar hespê xwe tîmar dike. Pisîka malê li ber siya dîwar raketiye. Derwêş, Xecê û Eslîxan jî li nav baxçe ne. Di baxçe de darên mezin ên mêweyan hene. Eslîxan li pişta xanî, li bin siya darekê, bi bûkika xwe dilîze. Ronî derketiye ser dara tûyê û tûyan dixwe. Tiraktora wan jî li ber deriyê baxçe ye. Keriyek pezê Derwêş heye. Xaniyê Derwêş gelekî xweş e.

BEŞA 2.
Dema xwendin û nivîsînê

## Li gorî agahiyên jorîn bersiva pirsên jêrîn bidin û binivîsin.

**1.** Derwêş li ku dijî?

..............................................................................................................................

**2.** Navê xanima Derwêş çi ye?

..............................................................................................................................

**3.** Çend zarokên Derwêş û Xecê hene?

..............................................................................................................................

**4.** Navê keça Derwêş çi ye?

..............................................................................................................................

**5.** Çend paceyên xanî hene?

..............................................................................................................................

**6.** Navê hespê Serdar çi ye?

..............................................................................................................................



BEŞA 3.
Dema xwendinê

## Li gorî agahiyên jorîn li hemberî hevokên jêrîn nîşaneya "R" (rast) an "Ç"yê (çewt) daynin.

**1.** Li dora xaniyê wan baxçeyekî mezin heye. ( )
**2.** Navê kurê wan ê biçûk Serdar e. ( )
**3.** Di baxçe de darên mezin ên mêweyan hene. ( )
**4.** Pisîka malê li bin siya darê raketiye. ( )
**5.** Li hemberî xanî hespek bi darekê ve girêdayî ye. ( )
**6.** Niha Serdar hespê xwe av dide. ( )




**BEŞA 4.**
Dema xwendinê

## Li gorî agahiyên jorîn hevok û navan hevyek bikin.

| | |
|---|---|
| **1.** Jineke rind û jêhatî ye. | Ronî |
| **2.** Ji sê jûran û hol, pêjgeh, daşir û serşokekê pêk tê. | Xecê |
| **3.** Li pişt xanî, li bin siya darekê, bi bûkika xwe dilîze. | Serdar |
| **4.** Derketiye ser dara tûyê û tûyan dixwe. | Xanî |
| **5.** Keriyek pezê wî heye. | Derwêş |
| **6.** Ji hespan gelekî hez dike. | Eslîxan |





**BEŞA 5.**
Dema lîstikê

**Mamik**

Helê melê,
Padîşah rabû serê kelê,
Rih heye, simêl belê.

(Pisîk)



**BEŞA 6.**
Dema xwendinê

## Hevokên kêm ên jêrîn bi agahiyên hemberî wan re hevyek bikin.

| | |
|---|---|
| **1.** Li dora xaniyê wan | *li ber siya dîwar raketiye.* |
| **2.** Niha Serdar | *darên mezin ên mêweyan hene.* |
| **3.** Pisîka malê | *bi bûkika xwe dilîze.* |
| **4.** Di baxçe de | *tûyan dixwe.* |
| **5.** Eslîxan li pişt xanî | *hespê xwe tîmar dike.* |
| **6.** Ronî derketiye ser dara tûyê û | *baxçeyekî mezin heye.* |

BEŞA 7.
Dema xwendinê

# Zozan

Zozanên me bilind in
Tev bi zevî û gund in

Tê de hene avên sar
Jê kêm nabin ber û dar

Raxerên wan gulçîçek
Teyr û tilûr lek bi lek

Havînan em diçin wan
Tevî koç û pez û gan

Derbas dikin rojên germ
Li ser wê nefela nerm

Dilîzin her direvin
Heyanî koç dakevin

Dema çiya dibin sar
Payîz dibe em tên xwar.

Osman Sebrî
*(Bi guhertinên biçûk)*





**BEŞA 8.**
Dema xwendin û guhdarîkirinê








# Rojeke Barzan

Ez saet di heftê sibehê de ji xewê şiyar dibim, dest û rûyê xwe dişom, porê xwe şeh dikim. Saet di heft û nîvan de taştê dixwim û diranên xwe firçe dikim. Piştî wê cil û bergên xwe li xwe dikim û çenteyê xwe hildigirim. Saet di heştan de siwarî servîsê dibim û diçim xwendingeha xwe. Ji saet heşt û nîvan heta diwazdehê nîvroyê li xwendingehê dersan dibînim. Piştî dersan dîsa siwarî Servîsa xwendingehê dibim û vedigerim mala xwe. Cil û bergên xwe diguherînim û firavînê dixwim. Piştî firavînê ji saet yekê heta didu û nîvan ez û hevalên xwe li derve dilîzin. Ji saet didu û nîvan heta pêncan dersên xwe tekrar dikim û sipartekên xwe çê dikim. Ji pêncan heta şeşan li televizyonê temaşe dikim. Saet di şeşan de şîvê dixwim û dest bi amadekariya dersên sibehê dikim û çenteyê xwe li gorî bernameya sibehê amade dikim. Ji bo ku sibehê zû şiyar bibim û biçim xwendingeha xwe ez saet di nehan de radikevim.







BEŞA 9.
Dema axaftin û nivîsînê

## Li gorî agahiyên jorîn bersiva pirsên jêrîn bidin û binivîsin.

**1.** Barzan saet di çendan de şiyar dibe?

**2.** Barzan piştî ku firavînê dixwe çi dike?

**3.** Barzan saet ji didu û nîvan heta pêncan çi dike?

**4.** Barzan piştî ku şîvê dixwe çi dike?

**5.** Barzan çenteyê xwe li gorî çi amade dike?

**6.** Barzan saet di çendan de radikeve?



BEŞA 10.
Dema axaftin û nivîsînê

## Bersiva pirsên jêrîn li gorî xwe bidin û binivîsin.

**1.** Tu saet di çendan de şiyar dibî?

**2.** Tu saet di çendan de diçî xwendingehê?

**3.** Tu kengî sipartekên xwe çê dikî?

**4.** Tu bi çi diçî xwendingehê?

**5.** Navên hevalên te çi ne?


**6.** Tu saet di çendan de şîvê dixwî?



**BEŞA 11.**
Dema xwendinê

## Li gorî agahiyên jorîn li hemberî hevokên jêrîn nîşaneya “R” (rast) an “Ç”yê (çewt) daynin.

**1.** Barzan ji pêncan heta heştan li televizyonê temaşe dike. (   )
**2.** Barzan saet di heft û nîvan de taştê dixwe. (   )
**3.** Barzan piştî taştê cil û bergên xwe li xwe dike. (   )
**4.** Barzan saet di heftan de şîva xwe dixwe. (   )
**5.** Barzan saet di heftan de siwarî servîsê dibe. (   )
**6.** Barzan piştî taştê çenteyê xwe hildigire. (   )



**BEŞA 12.**
Dema nivîsînê

## Bi bêjeyên tevlihev ên jêrîn, hevokên sererast çê bikin û binivîsin.



**1.** dipirse / ji Barzan / Mamoste
..........................................................................................

**2.** dest / Barzan /pê / dike/ dibêje / û
..........................................................................................

**3.** dişom / Ez / xwe / dest û rûyê
..........................................................................................

**4.** xwe / porê/ şeh / dikim / Ez
..........................................................................................

**5.** diranên / dikim / xwe / Ez / firçe
..........................................................................................


**6.** Ez / dibim / servîsê / siwarî
..........................................................................................



**BEŞA 13.**
Dema xwendinê

**Hevokên kêm ên jêrîn bi agahiyên hemberî wan re hevyek bikin.**

| | |
|---|---|
| **1.** Mamoste ji Barzan dixwaze ku | *amade dikim.* |
| **2.** Ez saet di heftê sibehê de | *diguherînim.* |
| **3.** Ez çenteyê xwe li gorî bernameya sibehê | *ji xewê şiyar dibim.* |
| **4.** Ez siwarî servîsa xwendingehê dibim | *û vedigerim mala xwe.* |
| **5.** Ez diranên xwe | *ew rojeke xwe vebêje.* |
| **6.** Ez cil û bergên xwe | *firçe dikim.* |



**BEŞA 14.**
Dema helbestê



## Dibistan

Dibistan pir xweşik e,
Bi hogir û hevalan
Bi nivîs û mamoste,
Bi çîroka newalan

Em hemî jê hez dikin,
Bo zanînê kanî ye
Tê de kenîn, leyîstok,
Dibistan xweş xanî ye.

Kamûran Bedirxan



**BEŞA 15.**
Dema xwendin û guhdarîkirinê



# Bajar

Li bajaran gelek mirov dijîn û dixebitin. Li bajaran avahiyên kevin û nû, nizm û bilind, dikan, xwendingeh û nexweşxane hene. Li piraniya wan, îstasyonên trênan û benderên keştiyan hene. Lê bajar li gorî serdeman diguherin. Hin bajarên berê navendên bazirganiyê bûn. Ev bajar nêzîkî benderan û li ser xaçerêyên girîng hatine avakirin. Gelek bajarên kevin li dora bircan ava bûne. Di nav gund û bajaran de gelek ferq hebûn. Gundiyan tiştên xwe dibirin û li bajaran difirotin. Di van sedsalên dawî de, li derdora bajaran gelek fabrîqe hatine avakirin. Gelek mirovan ji bo xebatê, ji gundan koçî van bajarên mezin kirine. Loma bajar zû mezin bûne. Piraniya nifûsa cîhanê li bajaran dijî û bajar zêdetir dibin. Li hin bajaran bi milyonan mirov bi cih bûne.

***Ansiklopediya Zarokan***
*(Bi guhertinên biçûk)*



**BEŞA 16.**
Dema axaftin û nivîsînê

## Li gorî agahiyên jorîn bersiva pirsên jêrîn bidin û binivîsin.

**1.** Li bajaran çi hene?

.............................................................................................................................

**2.** Bajar li gorî çi tên guhertin?

.............................................................................................................................

**3**. Hin bajarên berê navendên çi bûn?

.............................................................................................................................

**4.** Bajarên berê li ku hatine avakirin?


.............................................................................................................................

**5.** Bajar çima zû mezin bûne?

.............................................................................................................................

**6.** Piraniya nifûsa cîhanê li ku dijî?

.............................................................................................................................



**BEŞA 17.**
Dema nivîsînê

## Valahiyên jêrîn li gorî agahiyên jorîn dagirin.

**1.** Li bajaran gelek …………………….. dijîn û dixebitin.

**2.** Li bajaran avahiyên kevin û nû, nizm û …………..…. hene.

**3.** Bajarên berê navendên …………………………. bûn.

**4.** Bajarên berê nêzîkî benderan û li ser ………………. girîng hatine avakirin.

**5.** Gundiyan tiştên xwe dibirin û li bajaran …………………...

**6.** Di van sedsalên dawî de, li derdora bajaran ………………… hatine avakirin.



**BEŞA 18.**
Dema xwendinê

## Li gorî agahiyên jorîn, li hemberî hevokên jêrîn nîşaneya "R" (rast) an "Ç"yê (çewt) daynin.

**1.** Li bajaran nexweşxane nînin. ( )
**2.** Bajarên berê bajarên bazirganiyê bûn. ( )
**3.** Gelek mirovan ji bo geştê ji gundan koçî bajaran kirine. ( )
**4.** Piraniya nifûsa cîhanê li gundan dijî. ( )
**5.** Li hin bajaran bi milyonan mirov bi cih bûne. ( )
**6.** Gundiyan tiştên xwe dibirin û li bajaran difirotin. ( )



**BEŞA 19.**
Dema axaftin û nivîsînê

## Bêjeyên jêrîn di nav hevokekê de bi kar bînin.

**1.** Bajar: ......................................................................................................
**2.** Xwendingeh: ..............................................................................................
**3.** Bender: ....................................................................................................
**4.** Fabrîqe: ...................................................................................................
**5.** Gund: .......................................................................................................
**6.** Xaçerê: .....................................................................................................










**BEŞA 20.**
Dema xwendinê

## Hevokên kêm ên jêrîn bi agahiyên hemberî wan re hevyek bikin.

| | |
|---|---|
| **1.** Li bajaran gelek mirov | *serdeman diguherin.* |
| **2.** Li bajaran xwendingeh û | *li bajaran difirotin.* |
| **3.** Bajar li gorî | *bazirganiyê bûn.* |
| **4.** Hin bajarên berê navendên | *nexweşxane hene.* |
| **5.** Bajar li ser xaçerêyên girîng | *dijîn û dixebitin.* |
| **6.** Gundiyan tiştên xwe dibirin û | *hatine avakirin.* |



**BEŞA 21.**
Dema nivîsînê

## Ji bêjeyên jêrîn ên tevlihev, hevokên sererast çê bikin û binivîsin.

**1.** bajaran / Li / gelek / dijîn / mirov

.....................................................................................................................................

**2.** mezin / Bajar / bûne / zû

.....................................................................................................................................

**3.** fabrîqe / Gelek / avakirin / hatine

.....................................................................................................................................

**4.** bajaran / Gelek / koçî / mirovan / kirine

.....................................................................................................................................

**5.** li bajaran/  Gundiyan / difirotin / tiştên xwe

.....................................................................................................................................

**6.** Li bajaran / hene / kevin / avahiyên

.....................................................................................................................................







# UNÎTEYA

# 3

## LAŞ Û TENDURISTÎ

***Kirinek ji deh gotinan çêtir e.***

**Gotina Pêşiyan**




**BEŞA 1.**
Dema xwendin û guhdarîkirinê



# Tenduristiya dev û diranan

**Azad:** Evîn, diranên te gelek spî û paqij xuya dikin. Tu diranên xwe çawa diparêzî?
**Evîn:** Ez her serê sibehê piştî taştê bixwim, diranên xwe firçe dikim.
**Azad:** Ez jî her serê sibehê diranên xwe firçe dikim. Lê dîsa jî diranekî min kurmî bûye.
**Evîn:** Ez berî ku rakevim jî diranên xwe firçe dikim.
**Azad:** Mixabin ez carinan xwe ji bîr dikim û berî razanê diranên xwe firçe nakim.
**Evîn:** Ez hem sibeh û êvaran diranên xwe firçe dikim hem jî tayê diranan bi kar tînim.
**Azad:** Tayê diranan bi kêrî çi tê?
**Evîn:** Dema ku tiştek dikeve ber diranan mirov bi tayê diranan wî tiştî ji ber diranên xwe derdixe.
**Azad:** Ez jî dema goşt dixwim gelek caran goşt dikeve ber diranên min.
**Evîn:** Naxwe tu jî dikarî tayê diranan bi kar bînî.
**Azad:** Eger ez jî bi kar bînim dê diranên min jî mîna diranên te spî bibin?
**Evîn:** Bêguman, her sibeh û êvar eger tu diranên xwe firçe bikî û dema tiştek bikeve ber diranên te, tu tayê diranan bi kar bînî, diranên te jî dê spî û tendurist bimînin.



**BEŞA 2.**
Dema axaftin û nivîsînê





## Li gorî agahiyên jorîn bersiva pirsên jêrîn bidin û binivîsin.

**1.** Evîn diranên xwe çawa diparêze?

..................................................................................................................................

**2.** Diranê kê kurmî bûye?

..................................................................................................................................

**3.** Evîn berî ku rakeve diranên xwe firçe dike yan na?

..................................................................................................................................

**4.** Tiştên dikevin ber diranan, mirov bi çi derdixin?


..................................................................................................................................

**5.** Kî carinan xwe ji bîr dike û berî razanê diranên xwe firçe nake?

..................................................................................................................................

**6.** Diranên kê gelek spî û paqij xuya dikin?

..................................................................................................................................



**BEŞA 3.**
Dema nivîsînê



## Li gorî agahiyên jêrîn li hemberî hevokan "Azad" an jî "Evîn" binivîsin.

**1.** Diranên te gelek spî û paqij xuya dikin. ......................
**2.** Ez sibehan piştî taştê bixwim, diranên xwe firçe dikim. ......................
**3.** Diranekî min kurmî bûye. ......................
**4.** Ez berî ku rakevim diranên xwe firçe dikim. ......................
**5.** Ez dema goşt dixwim goşt dikeve ber diranên min. ......................
**6.** Ez tayê diranan bi kar tînim. ......................

**BEŞA 4.**
Dema xwendinê

## Hevokên kêm ên jêrîn bi agahiyên hemberî wan re hevyek bikin.

| | |
|---|---|
| **1.** Tu diranên xwe | *bi kar tînim.* |
| **2.** Ez her serê sibehê | *bi kêrî çi tê?* |
| **3.** Carinan goşt dikeve | *xwe ji bîr dikim.* |
| **4.** Mixabin ez carinan | *diranên xwe firçe dikim.* |
| **5.** Ez tayê diranan | *çawa diparêzî?* |
| **6.** Tayê diranan | *ber diranên min.* |



**BEŞA 5.**
Dema xwendinê

## Li gorî agahiyên jorîn li hemberî hevokên jêrîn nîşaneya “R” (rast) an “Ç”yê (çewt) daynin.


**1.** Dıranekî Azad kurmî bûye. ( )
**2.** Goşt dikeve ber diranên Evînê. ( )
**3.** Evîn carinan xwe ji bîr dike û berî razanê diranên xwe firçe nake. ( )
**4.** Azad her serê sibehê diranên xwe firçe dike. ( )
**5.** Diranên Azad gelek spî û paqij xuya dikin. ( )
**6.** Evîn tayê diranan bi kar tîne. ( )



**BEŞA 6.**
Dema xwendin û nivîsînê

## Pirsên jêrîn bi "erê" yan jî "na"yê bibersivînin.

1. Diranên te spî ne? ....................
2. Diranên te kurmî bûne? ....................
3. Tu her serê sibehê piştî taştê bixwî, diranên xwe firçe dikî? ....................
4. Tu berî ku rakevî diranên xwe firçe dikî? ....................
5. Tu tayê diranan bi kar tînî? ....................
6. Tu jî her êvar diranên xwe firçe dikî? ....................



**BEŞA 7.**
Dema nivîsînê

## Valahiyên jêrîn li gorî agahiyên jorîn dagirin.



1 . Tu diranên xwe ....................diparêzî?
2. Ez jî her serê sibehê diranên xwe ................. dikim.
3. Diranekî min ................bûye.
4. Tayê ....................bi kêrî çi tê?
5. Ez her sibeh û .................... diranên xwe firçe dikim.
6. Naxwe tu jî dikarî ............................ diranan bi kar bînî.



**BEŞA 8.**
Dema xwendin û guhdarîkirinê



# Navenda tenduristiya malbatan

Gulçînê di dersa werzişê de gelekî beziya û xwêdan da. Ji ber ku tî bû aveke sar ji kantînê kirî û vexwar. Piştî demekê qirika wê êşiya û ta girt. Ji ber vê yekê bi awayekî bêhal çû malê. Diya wê dema ku Gulçîn di vî halî de dît, demildest ew bir navenda tenduristiya malbatan. Fîşa xwe girtin û li benda dora xwe man. Gulçîn ji bijîşkan û ji derziyan gelek ditirsiya. Dema ku dora wan hat dilê wê kir gupegup. Çûn hundir, bijîşk, bi kêfxweşî xêrhatin li wan kir û kêfa xwe ji Gulçînê re anî. Gulçînê dema bijîşkê rûbiken dît tirsa wê şikiya. Piştî ku bijîşk ew miayene kir, jê re derman nivîsî û got:

-Ka bibêje keçika delal! Te çi vexwar ku qirika te wiha werimî?

Gulçînê got:

-Mamê bijîşk, do piştî dersa werzişê min ava sar vexwar.

Bijîşk got:

-Keça min, dema mirov xwêdan bide, divê mirov ava sar venexwe. Ji niha û pê ve piştî dersa werzişê divê tu cil û bergên xwe biguherînî û ava sar jî venexwî.

Gulçînê soz da bijîşkê xwe û bi dilekî rehet ew û diya xwe ji jûra bijîşk derketin û çûn malê.



**BEŞA 9.**
Dema axaftin û nivîsînê

## Li gorî agahiyên jorîn bersiva pirsên jêrîn bidin û binivîsin.

**1.** Gulçînê li ku aveke sar kirî û vexwar?

........................................................................................................................................

**2.** Gulçîn çima çû malê?

........................................................................................................................................

**3.** Dema ku diya Gulçînê ew di wî halî de dît, çi kir?

........................................................................................................................................

**4.** Gulçîn ji çi gelekî ditirsiya?


........................................................................................................................................

**5.** Piştî ku bijîşk ew miayene kir, jê re çi nivîsî?

........................................................................................................................................

**6.** Bijîşk ji Gulçinê re çi got?

........................................................................................................................................



**BEŞA 10.**
Dema axaftin û nivîsînê

## Bêjeyên jêrîn di nav hevokekê de bi kar bînin.


**1. Dersa werzişê**: ..........................................................................................
**2. Bijîşk**:......................................................................................................
**3. Xwêdan**: ...................................................................................................
**4. Nexweşxane**: ............................................................................................
**5. Qirik**: .......................................................................................................
**6. Cil û berg**: ...............................................................................................



BEŞA 11.
Dema xwendinê

## Hevokên kêm ên jêrîn bi agahiyên hemberî wan re hevyek bikin.

| | |
|---|---|
| **1.** Fîşa xwe girtin û | *û ta girt.* |
| **2.** Gulçîn ji bijîşkan û ji derziyan | *dilê wê kir gupegup.* |
| **3.** Piştî ku bijîşk ew miayene kir, | *ji kantînê kirî û vexwar.* |
| **4.** Ji ber ku tî bû aveke sar | *li benda dora xwe man.* |
| **5.** Dema ku dora wan hat | *jê re derman nivîsî.* |
| **6.** Piştî demekê qirika wê êşiya | *gelekî ditirsiya.* |



BEŞA 12.
Dema nivîsînê

## Ji bêjeyên tevlihev ên jêrîn, hevokên sererast çê bikin û binivîsin.

**1.** gelekî / Gulçînê / baz da

.....................................................................................................................................

**2.** aveke / Ji kantînê / kirî / sar

.....................................................................................................................................

**3.** zêde / canê wê / bû / Agirê

.....................................................................................................................................

**4.** navenda tenduristiya malbatan / bir / demildest / ew / Diya wê

.....................................................................................................................................

**5.** ditirsiya / ji bijîşkan / gelekî / Gulçîn


.....................................................................................................................................



**BEŞA 13.**
Dema xwendinê

## Li gorî agahiyên jorîn li hemberî hevokên jêrîn nîşaneya “R” (rast) an “Ç”yê (çewt) daynin.

**1.** Gulçînê di dersa werzişê de gelekî baz da û xwêdan da. (   )
**2.** Ji ber ku tî bû aveke germ ji kantînê kirî û vexwar. (   )
**3.** Piştî demekê qirika wê êşiya û canê wê cemidî. (   )
**4.** Fîşa xwe girtin û li benda dora xwe man. (   )
**5.** Gulçînê ji bijîşkan û ji derziyan gelekî hez dikir. (   )
**6.** Dema ku dora wan hat Gulçîn kêfxweş bû. (   )



**BEŞA 14.**
Dema nivîsînê

## Valahiyên jêrîn li gorî agahiyên jorîn dagirin.

**1.** Piştî ku bijîşk ew miayene kir, jê re …………….. nivîsî.
**2.** Te çi vexwar ku qirika te wiha ………………?
**3.** Mamê bijîşk, do piştî dersa werzişê min ava sar ……………...
**4.** Keça min, dema mirov xwêdan bide, divê ava …………….. venexwe.
**5.** Ji niha û pê ve piştî dersa werzişê divê tu cil û bergên xwe …………………
**6.** Gulçînê soz da ………………… xwe.

BEŞA 15.
Dema xwendinê



# Berfîn ji paqijiyê hez dike

Berfîn serê sibehê ji xewê rabû, berî taştê dest û rûyê xwe bi sabûnê şûştin. Ew dizane ku bi destên neşûştî tiştekî bixwe, mîkrob dê derbasî laşê wê bibin û dê nexweş bikeve. Berfînê piştî taştê, amadekariya xwendingehê kir; porê xwe şeh kir, neynûkên xwe jêkirin, diranên xwe firçe kirin û cil û bergên xwe li xwe kirin. Ji ber ku derve sar bû cilên germ li xwe kirin. Berfîn û hevalên xwe di bêhnvedanê de li baxçeyê xwendingehê lîstin. Piştî lîstikê çûn destşokê û destên xwe bi sabûnê şûştin. Berfîn dema vegeriya malê, cil û bergên xwe guherandin, çû serşokê serê xwe şûşt û cilên nav malê li xwe kirin. Lewra cil û bergên ku li xwendingehê li xwe kiribûn, qirêj bûbûn. Ji ber ku Berfîn ji paqijiyê pir hez dike zû bi zû nexweş nakeve.



**BEŞA 16.**
Dema axaftin û nivîsînê

## Li gorî agahiyên jorîn bersiva pirsên jêrîn bidin û binivîsin.

**1.** Piştî ku Berfîn sibehê ji xewê rabû çi kir?

..........................................................................................................................................

**2.** Çima Berfîn cilên germ li xwe dike?

..........................................................................................................................................

**3.** Berfînê di bêhnvedanê de bi kê re lîst?


..........................................................................................................................................

**4.** Berfîn û hevalên xwe piştî lîstikê çi kirin?

..........................................................................................................................................

**5.** Berfîn dema vegeriya malê, çima cil û bergên xwe guherandin?

..........................................................................................................................................



**BEŞA 17.**
Dema nivîsînê

## Bi bêjeyên tevlihev ên jêrîn, hevokên sererast çê bikin û binivîsin.

**1.** serê sibehê / Berfîn / rabû / ji xewê

..........................................................................................................................................

**2.** xwe / şeh kir / Porê

..........................................................................................................................................

**3.** kirin / germ / Cilên / li xwe

..........................................................................................................................................

**4.** kirin / nav / Cilên/  li xwe / malê

..........................................................................................................................................

**5.** xwe / Destên / şûştin / bi sabûnê

..........................................................................................................................................

**6.** jêkirin / xwe / Neynûkên


..........................................................................................................................................



**BEŞA 18.**
Dema xwendinê

## Hevokên kêm ên jêrîn bi agahiyên hemberî wan re hevyek bikin.

| | |
|---|---|
| **1.** Berî taştê | *bi sabûnê dişo.* |
| **2.** Berfîn, destên xwe | *şeh kir.* |
| **3.** Berfînê piştî taştê, | *li xwe kirin.* |
| **4.** Porê xwe | *cilên germ li xwe kirin.* |
| **5.** Cil û bergên xwe | *dest û rûyê xwe bi sabûnê şûştin.* |
| **6.** Ji ber ku derve sar bû | *amadekariya xwendingehê kir.* |



**BEŞA 19.**
Dema lîstikê

## Xaçepirs

| | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| W | E | M | Î | K | R | O | B | U | W | Q |
| A | G | I | X | H | E | D | A | T | E | U |
| R | W | A | W | G | D | E | S | E | T | J |
| **T** | **A** | **Y** | **Ê** | **D** | **I** | **R** | **A** | **N** | **A** | **N** |
| E | G | E | D | E | R | Z | D | D | W | E |
| F | I | N | A | R | A | Î | E | U | E | X |
| I | R | E | N | M | N | A | D | R | R | E |
| S | T | U | Q | A | K | N | R | I | Z | Ş |
| A | D | H | E | N | K | Û | T | S | I | K |
| B | F | N | R | L | L | J | G | T | Ş | J |
| U | G | J | T | A | A | D | H | Î | A | H |
| **N** | **E** | **X** | **E** | **Ş** | **X** | **A** | **N** | **E** | W | Q |
| P | A | Q | I | J | Î | R | J | U | D | F |
| F | I | R | Ç | E | K | I | R | I | N | K |

AGIR
DERMAN
DERZÎ
DIRAN
FIRÇE KIRIN

LAŞ
NEXWEŞ
MÎKROB
MIAYENE

PAQIJÎ
SABÛN

**TAYÊ DIRANAN**
TENDURISTÎ
WERZIŞ
XWÊDAN







# UNÎTEYA

4

## DEMSAL Û SALNAME

***Aqilê sivik barê giran.***

**Gotina Pêşiyan**



**BEŞA 1.**
Dema xwendin û guhdarîkirinê



# Bihar

Navê min Rojda ye. Îsal jî mîna salên berê ez di meha adarê de çûm nav baxçeyê bapîrê xwe. Her der bi giya û kulîlkên rengîn xemilîbû. Di nav wan kulîlkên xweşik de bi taybetî beybûnên zer û spî bala min kişand. Min ji bapîrê xwe re got:

-Kalo can, ez dikarim qevdek beybûn ji mamosteyê xwe re biçinim?

Bapîrê min got:

-Bijî keça min, tu pir jîr î. Ji bo rêzgirtina mamosteyê xwe tu dikarî biçinî.

Min jî bi dilxweşî qevdek beybûn berhev kir û min berê xwe da xwendingehê.

**BEŞA 2.**
Dema xwendin û nivîsînê

## Li gorî agahiyên jorîn li hemberî hevokên jêrîn nîşaneya "R" (rast) an "Ç"yê (çewt) daynin.

**1.** Rojda îsal nû çûye baxçeyê bapîrê xwe. ( )

**2.** Rojda di meha gulanê de çûye baxçeyê bapîrê xwe. ( )

**3.** Rojda ji mamosteyê xwe hez dike. ( )

**4.** Rojda ji mamosteyê xwe re qevdek beybûn diçine. ( )

**5.** Bapîrê Rojda nahêle ku ew beybûnan ji mamosteyê xwe re bibe. ( )

**BEŞA 3.**
Dema nivîsînê



## Li gorî agahiyên jorîn cihên vala bi bêjeyên rast dagirin.

**1.** Îsal jî mîna salên ............. ez di meha ...................... de çûm nav baxçeyê bapîrê xwe.

**2.** Her der bi giya û kulîlkên ....................... xemilîbû.

**3.** Kalo can, ez dikarim .................... beybûn ji mamosteyê xwe re .................... ?

**4.** Ji bo .................................... mamosteyê xwe tu .......................... biçinî.

**5.** Min jî bi .......................... qevdek beybûn çinî û berê xwe da .......................... .

BEŞA 4.
Dema xwendin û nivîsînê

**Hûn kîjan kulîlkan didin mamosteyên xwe, binivîsin û bixwînin.**

..........................................................................................................................................

..........................................................................................................................................

..........................................................................................................................................

..........................................................................................................................................

..........................................................................................................................................

..........................................................................................................................................

..........................................................................................................................................

..........................................................................................................................................

..........................................................................................................................................

..........................................................................................................................................

..........................................................................................................................................





BEŞA 5.
Dema xwendin û guhdarîkirinê



# Havîn

Navê min Gulsim e. Mala me li Diyarbekirê ye. Havînan Diyarbekir gelekî germ e. Loma jî em di meha tebaxê de diçin Liceyê mala dapîra min. Dema em di deşta Diyarbekirê re derbas dibin bênderên kayê û lodên genim li ber çavên me dikevin. Lewra havîn demsala çinîn û rakirina debirê ye. Piştî pêncî kîlometreyî deşta zer bi dawî dibe û çiyayên bi dar û ber dest pê dikin. Jixwe Lice jî di nav çiyayên bi dar û ber de ye û li ber xanîyan baxçe hene.

Ez herî zêde ji baxçeyê mala dapîra xwe hez dikim. Di baxçeyên wan de darên sêv, mişmiş, alûc û gilyazan hene. Berêvaran em bi malbatî diçin nav baxçe. Dapîra min sêv, mişmiş, alûc û gilyazan dide min. Diya min ji bo xweşavê sêv û mişmişên zêde hişk dike. Ez ji Liceyê gelekî hez dikim lewra hênik e û mêweyên wê jî xweş in.

BEŞA 6.
Dema nivîsînê

## Li gorî agahiyên jorîn bersiva pirsên jêrîn binivîsin.

1. Havînan hewaya Diyarbekirê çawa ye?

..............................................................................................................................................

2. Dema Gulsim diçe Liceyê li deşta Diyarbekirê çi dibîne?

..............................................................................................................................................

3. Gulsim diçe mala kê?

..............................................................................................................................................

4. Gulsim herî zêde ji çi hez dike?

..............................................................................................................................................

5. Di baxçeyê mala dapîra Gulsimê de kîjan dar hene?

..............................................................................................................................................

6. Diya Gulsimê kîjan mêweyan hişk dike û çima?

..............................................................................................................................................



BEŞA 7.
Dema nivîsînê

## Li gorî agahiyên jorîn cihên vala bi bêjeyên rast dagirin.

**1.** Em di meha ........................ de diçin Liceyê.
**2.** Dema em di deşta Diyarbekirê re derbas dibin bênderên .............. û lodên .............. li ber çavên me dikevin.
**3.** Havîn demsala ..................... û rakirina ....................... ye.
**4.** Piştî ..................... kîlometreyî deşta ................ bi dawî dibe û çiyayên .............................dest pê dikin.
**5.** Ez ji Liceyê gelekî ....................... lewra hênik e û ................................ xweş in.

**BEŞA 8.**
Dema xwendin û nivîsînê

**Havînan hewaya bajarê we çawa ye û di vê demsalê de li bajarê we çi guhertin çê dibin? Binivîsin û bixwînin.**

.......................................................................................................................................
.......................................................................................................................................
.......................................................................................................................................
.......................................................................................................................................
.......................................................................................................................................
.......................................................................................................................................
.......................................................................................................................................
.......................................................................................................................................
.......................................................................................................................................





BEŞA 9.
Dema xwendin û guhdarîkirinê



# Payîz

Navê min Rêzan e. Ez ji mêj ve ji meha îlonê hez dikim. Lewra di vê mehê de hewa hênik dibe. Ji ber vê, ez ji diya xwe destûr dixwazim û bi kêfxweşî li derve digel hevalên xwe dilîzim. Dema em li bin daran rûdinin pelên wan diweşin û bi ser me de tên xwarê. Dema ez vê dîmena daran dibînim dilê min zîz dibe û ez bi xemgînî diçim malê.

Êvarê min ji bavê xwe re got: Bavo, çima payîzan pelên daran diweşin û biharan careke din derdikevin? Bavê min got: Kurê min, di her demsalê de siruşt diguhere. Payîzan ji ber ku serma zêde dibe pelên daran diweşin. Biharan dîsa derdikevin û dar xwe nû dikin.

**BEŞA 10.**
Dema xwendin û nivîsînê

## Li gorî agahiyên jorîn pirsên jêrîn bixwînin û bersiva wan binivîsin.

1. Rêzan çima ji meha îlonê hez dike?

..................................................

2. Ji bo çi dilê Rêzan zîz dibe?

..................................................

3. Rêzan kengê û li ku digel hevalên xwe dilîze?

..................................................

4. Rêzan ji bavê xwe çi dipirse?

..................................................

5. Bavê wî bersiveke çawa dide Rêzan?

..................................................

**BEŞA 11.**
Dema xwendin û nivîsînê

## Bi bêjeyên jêrîn ên tevlihev, hevokên sererast çê bikin û binivîsin.

1. ji mêj ve / ji / Ez / meha îlonê / hez dikim

..................................................

2. ji / re / got / bavê xwe / Êvarê / min /

..................................................

3. çima / payîzan / diweşin / Bavo / pelên daran

..................................................

4. Kurê min / diguhere / siruşt / di her demsalê de

..................................................

5. dibînim / Dema / vê dîmena daran / zîz dibe / ez / dilê min

..................................................



BEŞA 12.
Dema nivîsînê

**Hûn jî li ser demsala payîzê û guhertinên vê demsalê fikrên xwe binivîsin û bixwînin.**

...........................................................................................................................

...........................................................................................................................

...........................................................................................................................

...........................................................................................................................

...........................................................................................................................

...........................................................................................................................

...........................................................................................................................

...........................................................................................................................

...........................................................................................................................



BEŞA 13.
Dema xwendin û guhdarîkirinê



# Zivistan

Navê min Berfîn e. Ez li bajarê Wanê dijîm. Zivistanan bajarê me çar pênc mehan di bin berfê de dimîne. Berf hem çiyayê Erekê hem dar û beran hem jî kuçe û kolanên bajêr dinixumîne. Wê demê tenê Gola Wanê bi rengê xwe yê şîn mîna berê dimîne. Bi taybetî di her du mehên kanûna paşîn û sibatê de ev dîmen xweşiktir dibe. Herçend hewa sar be jî ez dîsa ji zivistanên Wanê hez dikim.

**BEŞA 14.**
Dema xwendinê

## Li gorî agahiyên jorîn li hemberî hevokên jêrîn nîşaneya “R” (rast) an “Ç”yê (çewt) daynin.

**1.** Berfîn li Wanê dijî. ( )
**2.** Zivistanan bajarê Wanê çar pênc mehan di bin berfê de namîne. ( )
**3.** Berfîn ji mehên kanûna paşîn û sibatê hez nake. ( )
**4.** Berfîn ji zivistanên Wanê hez dike. ( )
**5.** Zivistanan Wan sar nîne. ( )
**6.** Berf li Wanê gelekî dibare. ( )




**BEŞA 15.**
Dema axaftin û nivîsînê

## Li gorî agahiyên jorîn hevokên kêm ên jêrîn û agahîyên li hemberî wan hevyek bikin.

| | |
|---|---|
| 1. Bi taybetî di mehên kanûna paşîn û sibatê de | *dinixumîne.* |
| 2. Ez li bajarê Wanê | *ji zivistanên Wanê hez dikim.* |
| 3. Zivistanan bajarê me çar pênc mehan | *mîna berê dimîne.* |
| 4. Berf kuçe û kolanên bajêr | *dijîm.* |
| 5. Wê demê tenê Gola Wanê bi rengê xwe yê şîn | *ev dîmen xweşiktir dibe.* |
| 6. Herçend hewa sar be jî ez dîsa | *di bin berfê de dimîne.* |

BEŞA 16.
Dema xwendin û nivîsînê

**Zivistanan li devera we çi guhertin çê dibin, binivîsin û bixwînin.**

.................................................................................................................................
.................................................................................................................................
.................................................................................................................................
.................................................................................................................................
.................................................................................................................................
.................................................................................................................................
.................................................................................................................................
.................................................................................................................................



**BEŞA 17.**
Dema nivîsînê

- NÎSAN
- SIBAT
- KANÛNA PAŞÎN
- ÇIRIYA PÊŞÎN
- HEZÎRAN

## Li gorî navên mehên jorîn bersiva pirsên jêrîn binivîsin.

**1.** Navê meha yekem ................................................................e.
**2.** Navê meha duyem ................................................................e.
**3.** Navê meha sêyem ................................................................e.
**4.** Navê meha çarem ................................................................e.
**5.** Navê meha pêncem ................................................................e.
**6.** Navê meha şeşem ................................................................e.
**7.** Navê meha heftem ................................................................e.
**8.** Navê meha heştem ................................................................e.
**9.** Navê meha nehem ................................................................e.
**10.** Navê meha dehem ................................................................e.
**11.** Navê meha yazdehem ................................................................e.
**12.** Navê meha diwazdehem ................................................................e.

- GULAN
- TÎRMEH

- KANÛNA PÊŞÎN
- ADAR
- TEBAX
- ÎLON
- ÇIRIYA PAŞÎN

**BEŞA 18**
Dema nivîsînê

## Valahiyên jêrîn bi navên rojan ên li kêlekê dagirin.

**1.** Navê roja yekem ..........................................................e.
**2.** Navê roja duyem ..........................................................e.
**3.** Navê roja sêyem ..........................................................e.
**4.** Navê roja çarem ..........................................................e.
**5.** Navê roja pêncem ........................................................e.
**6.** Navê roja şeşem ..........................................................ye.
**7.** Navê roja heftem ..........................................................e.

DUŞEM
ÎN
YEKŞEM
ÇARŞEM
SÊŞEM
ŞEMÎ
PÊNCŞEM

**BEŞA 19.**
Dema nivîsînê

## Li saetên jêrîn binêrin û saet çend e, binivîsin.

............................ 

............................ 

............................ 

............................ 

............................ 

............................ 

**BEŞA 20.**
Dema helbestê

Sê tas in
Sê bintas in
Sê meymûnk in
Sê reqas in
Çi ye?

saet

Mamikê mino
Heft in, nabin heşt.
Çi ye?

Rojên heftiyê

Mamikê mino
Çar in, nabin pênc.
Çi ye?

Demsal

**BEŞA 21.**
Dema mamikan

## Zivistan

Deng ji ewran tê û birûsk dikin qîrîn
Bapêşk davêje û tav dike nalîn

Geh baran tê û geh teyrok bi rep rep,
Ba berfê davêje geh rast û geh çep

Rengê zeviyê bi spî tê guhertin
Xaçerê û şiverê tev têne girtin

Serma bi bager û bahoz û bi pûk û zîp
Şînahî dikuje dimînin kelem û zîp

Sê meh serma dibe serdar û xunkarê cîhan
Kurdan navê wan mehan kiriye zivistan

Cegerxwîn



BEŞA 22.
Dema nivîsînê

## Li gorî agahiyên helbesta jorîn bersiva pirsên jêrîn binivîsin.

**1.** Di zivistanê de deng ji çi tê?

..........................................................................................................................

**2.** Di zivistanê de çi dike qîrîn û çi dike nalîn?

..........................................................................................................................

**3.** Di zivistanê de çi dibare?

..........................................................................................................................

**4.** Di zivistanê de rengê zeviyan çawa dibe?

..........................................................................................................................

**5.** Kurdan navê her sê mehên sar kiriye çi?

..........................................................................................................................

BEŞA 23.
Dema nivîsînê

## Bêjeyên jêrîn di nav hevokekê de bi kar bînin.

**1.** Birûsk: ..........................................................................................................

**2.** Ewr: ..............................................................................................................

**3.** Baran: ...........................................................................................................

**4.** Berf: .............................................................................................................

**5.** Xaçerê: ..........................................................................................................


**6.** Şiverê: ..........................................................................................................



# UNÎTEYA

## 5

## XWARIN Û VEXWARINÊN ME





## *Dara xebatkaran tim biber e*

**Gotina Pêşiyan**



**BEŞA 1.**
Dema xwendin û guhdarîkirinê

# Xwarin û vexwarinên me



Ez dê qetek kade bixwim.



Tu dê pariyek penîr bixwî.



Ew dê seriyek pîvaz bixwe.



Em dê hinek nivîşk bixwin.



Hûn dê tasek mast bixwin.



Ew dê sîniyek birinc bixwin.



Ez dê ava sûsê vexwim.



Tu dê dewê sar vexwî.



Ew dê ava mişmişan vexwe.



Em dê çayeke zelal vexwin.



Hûn dê şorbenîskê vexwin.




Ew dê ava kaniya gund vexwin.

**BEŞA 2.**
Dema nivîsînê


## Valahiyên jêrîn li gorî danên xwarinê bi bêjeyên guncaw dagirin.

1. Ez dê di taştê de ……………..........vexwim.
2. Em dê di firavînê de ……………........bixwin.
3. Hûn dê di şîvê de …………………bixwin.
4. Mirov di paşîvê de dikare hem …….……vexwe hem jî ………………bixwe.

Ava mişmişan



Nan



Şorbenîsk



Birinc



Mast





**BEŞA 3.**
Dema xwendin û guhdarîkirinê



**Siyabend**: Bawer, were em biçin mala me, diya min şîraniyek çê kiriye.
**Bawer** : Çi çê kiriye?
**Siyabend**: Sêlmî.
**Bawer** : Ew çi ye?
**Siyabend**: Şîraniyeke herêmî ye.
**Bawer** : Ji çi çê dikin?
**Siyabend**: Ji penîrê teze, arvan û dimsê.
**Bawer** : Çawa çê dibe?
**Siyabend**: Penîrê teze hûr dikin, davêjin quşxaneyê û penîr dihele.
**Bawer** : Piştre?
**Siyabend**: Piştre, hinek arvan dikin ber û tev didin heta ku sor dibe. Piştî ku sor bû, tasek şerbeta dimsê berdidin ser û hinekî din sor dikin, dibe sêlmî.
**Bawer** : Tu van çawa dizanî?
**Siyabend**: Dema ku diya min du hefte berê çê kiribû, min bala xwe dabûyê.
**Bawer** : Hiiim, diyar e pir xweş e! Ez ji diya xwe destûrê digirim û têm.
**Siyabend**: Baş e, li benda te me.

BEŞA 4.
Dema lîstikê





## Sparteka min

Îro ji bo siparteka dersa Zanyariya Jiyanê, min bi dapîra xwe re suhbet kir. Min jê pirsî gelo sebzeyên havînê kîjan in? Wê jî bersiv da û got: Firingî, ecûr, îsot, bacan, xiyar, kundir… Min got, hinek ji van fêkiyan zivistanan jî çê dibin. Wê got, belê hinek jê zivistanan di bin necteran de jî çê dibin, lê em ji wan re dibêjin sebzeyên havînan. Piştre ez jê hîn bûm ku kelem, kartol, ispenax, silk, marûl jî sebzeyên zivistanê ne. Dapîra min heştê û pênc salî ye û hê jî li ser xwe ye. Ji xwarinên bi sebze pir hez dike. Ez lê çûme, ez jî ji xwarinên bi sebze pir hez dikim.

**Ji sebze û fêkiyên kêlekê tenê sebzeyan li gorî demsalên wan hevyek bikin.**

Havîn

Firingî
Kelem
Mişmiş
Kartol
Bacan
Ecûr
Xox

Zivistan



BEŞA 5.
Dema xwendinê

# Axa û xulam

Axa, rojekê nexweş ket. Bangî xulamê xwe kir û got:

-Here ji bijîşk re bibêje, axayê min nexweş ketiye; serê wî werimiye bûye kundir, pozê wî werimiye bûye gêzer, çepilê wî werimiye bûye xiyar, zikê wî bûye zebeş.

Xulam got:

-Axa ez dê bibêjim, axayê min bûye bostan.

(Ji zargotina kurdî)



(portreya G.Arcimboldo)



BEŞA 6.
Dema axaftin û nivîsînê

**Hûn jî li ser xwarin û vexwarinê pêkenokekê bibêjin û binivîsin.**

.................................................................................................

.................................................................................................

.................................................................................................

.................................................................................................

.................................................................................................


.................................................................................................

.................................................................................................

.................................................................................................

.................................................................................................

BEŞA 7
Dema xwendinê



# Bostanê me

Li ber çem bostanekî me yê mezin heye. Em her sal tê de gelek tiştan diçînin. Me îsal bostanê xwe kir şeş mişar. Me mişara pêşîn kiriye pîvazterk. Me ya duyem kiriye bexdenûs. Me ya sêyem kiriye kundir. Li mişara çarem me firingî danîne. Li mişara pêncem me îsot danîne. Mişara dawîn a nêzîkî devê çem jî me kiriye petêx.

**BEŞA 8.**
Dema axaftin û nivîsînê



Zozan bi diya xwe re çû marketê. Ji reyonekê hin sebze û fêkiyên ku ji gund hatibûn kirîn.

Eger ev sebze ji bostanên ber çem hatibin, dê kîjan neketibin selika Zozanê?

1. Firingî
2. Kundir
3. Bacan
4. Pîvazterk
5. Bamye
6. Îsot
7. Gêzer
8. Petêx

BEŞA 9.
Dema xwendinê



# Mamikên kalikê min

Gulê, bi hevala xwe Evînê re suhbet dike. Dibêje, em dawiya vê hefteyê çûn mala kalikê min. Baxçeyê wan pir xweş e. Tê de hewzek heye, darfêkî hene, sebzeyên biçêj hatine çandin. Kalikê min piştî ku dar û sebzeyên baxçe av dan, li ser kursiyê li ber hewzê rûnişt û got: “Ka ez dê ji we zarokan çend mamikan bipirsim.” Ez û birayê xwe em li ber lingê wî rûniştin û me bi mereq guhdariya wî kir. Kalikê min çar mamik ji me pirsîn. Ka ez jî ji te bipirsim, tu dê bizanî?



Ji jehrê taltir e
Ji şekir şîrîntir e
Ji sêvê biçûktir e
Ji dûvê miyê birûntir e

(gûz)

Mamikê mino mamanî
Bûk li hundir e
Porê wê li der e
Ew çi ye?

(garis)

Mamikê mino mamanî
Serî wek minarê ye
Bi serkitî li erdê ye


(gezer)

Tiştekê mino tiştanî
Fistankesk e
Kirassor e
Bişkojreş e
Ew çi ye?

(zebeş)




**BEŞA 10.**
Dema axaftin û nivîsînê



**Hûn jî li ser xwarin û vexwarinan du mamikan bibêjin û binivîsin.**

.................................
.................................
.................................
.................................


.................................
.................................
.................................
.................................



**BEŞA 11.**
Dema lîstikê


**Di xaçepirsa jêrîn de navên 10 xurek û vexurekan bibînin.**

| | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| A | E | B | L | O | Q | E | L | Î | P |
| X | W | E | Ş | A | V | D | O | K | A |
| A | Ç | Ş | E | R | B | E | T | S | T |
| K | A | A | B | I | K | E | T | S | Î |
| A | Q | Û | K | A | N | Î | S | A | L |
| K | E | B | A | B | I | K | A | D | E |
| I | S | I | M | I | M | A | V | Î | Ş |
| L | Ê | R | E | H | A | S | A | E | T |
| A | H | I | H | Ê | K | E | R | Û | N |
| N | A | N | Î | K | Î | Y | E | L | O |
| Î | E | C | R | A | T | Ê | Y | A | W |









# UNÎTEYA 6

## HATÛÇÛ GEŞTÛGER

***Roviyekî gerok, ji şêrekî xewar çêtir e.***

**Gotina Pêşiyan**


**BEŞA 1.**
Dema xwendinê



# Geşta bi balafirê

Mîrxan û Rûken du xwendekarên zanîngehê ne. Ev bîst sal in dê û bavên wan ji welat derketine û li Swêdê li bajarê Stockholmê dijîn. Mîrxan û Rûkenê biryar dan ku îsal biçin Diyarbekirê. Lê paseportên wan tunebûn. Eger kesek bixwaze ji welatekî biçe welatekî din, pêwîst e paseporta wî hebe. Wan jî ji xwe re paseport derxistin.

Ji bo riyên dirêj wesayîta herî baş balafir e. Lê ji ber ku balafir bi hêsanî û di demeke kurt de digihîje cihê xwe, buhayê wê ji ya hemû wesayîtan zêdetir e. Li Swêdê ji bo Tirkiyeyê gelek fîrmayên xetên hewayê hene. Kesên ku bixwazin bi erzanî bifirin, divê cihê xwe zû veqetînin. Ji karê veqetandina cihan re rezervasyon dibêjin. Mîrxan û Rûkenê jî berî ku bên bi du mehan rezervasyona xwe kirin û bilêtên xwe bi erzanî birîn.



**BEŞA 2.**
Dema nivîsînê

## Li gorî agahiyên jorîn bersiva pirsên jêrîn binivîsin.

**1.** Paseport ji bo çi pêwîst e?

..................................................................................................................................

**2.** Ji bo riyên dirêj wesayîta herî baş kîjan e?

..................................................................................................................................

**3.** Mîrxan û Rûkenê, berî ku bên bi çend mehan rezervasyona xwe kirin?

..................................................................................................................................

**4.** Ji bo rêwî bilêtan bi erzanî bibirin divê çi bikin?

..................................................................................................................................


**5.** Rezervasyon çi ye?

..................................................................................................................................












BEŞA 3.
Dema xwendinê

# Veguhestin û rotara balafiran

Ji cihên ku balafir radibin û dadikevin re balafirgeh tê gotin. Carinan di navbera du balafirgehan de firînên rasterast çê nabin. Wê demê rêwî bi du balafiran difirin. Balafira pêşî rêwiyan datîne balafirgeheke din. Rêwî li wir li balafireke din siwar dibin û diçin cihê xwe. Ji vî karî re “veguhestin” dibêjin. Ji Swêdê heta Diyarbekirê jî firînên rasterast nînin. Loma balafira Mîrxan û Rûkenê pêşî li balafirgeha Stenbolê rawestiya. Balafira Diyarbekirê ji ber ku xerab bûbû, piştî heşt saetan bi rotar rabû û bi derengî gihîşt balafirgeha Diyarbekirê. Mîrxan û Rûken bi taksiyê çûn mala mamê xwe Zîwer Beg.





BEŞA 4.
Dema nivîsînê

## Li gorî agahiyên jorîn valahiyên jêrîn dagirin.

**1.** Ji cihên ku balafir radibin û dadikevin re …………………. tê gotin.

**2.** Ji ……………......…....… heta ……………........……. jî firînên rasterast nînin.

**3.** Carinan di navbera du balafirgehan de ……………………………. çê nabin.

**4.** Balafira Diyarbekirê ji ber ku xera bû, piştî heşt saetan ………………… rabû.

**5.** Mîrxan û Rûken bi ………...……………çûn mala mamê xwe Zîwer Beg.

BEŞA 5.
Dema axaftin û nivîsînê



# Li welatê me cihên geştûgerê

Zîwer Beg ji Diyarbekirê ye. Mamosteyekî malnişîn û şareza ye. Bi biraziyên xwe re li ser sifreya xwarinê dest bi suhbetê kirin. Rûkenê ji mamê xwe pirsî:

-Mamo, li welatê me kîjan cihên tûrîstîk hene?

Zîwer Beg bi vê pirsê gelekî şa bû û got:

-Binêre Rûken can, her cihê welatê me tûrîstîk e. Em bi kurdî ji "tûrîzm"ê re dibêjin "geştiyarî" û ji "tûrîst"an re jî dibêjin "geştiyar". Ez dê navên çend bajarên dîrokî ji te re bibêjim:

Diyarbekir, Gêl, Farqîn, Lice, Bazîd, Bedlîs, Tetwan, Riha, Cizîr, Şirnex, Sêrt, Mêrdîn, Dara, Colemêrg, Miks, Wan, Semsûr, Dêrsim, Hîzan, Dihok, Amêdî, Hewlêr, Rewandiz, Silêmanî, Kerkûk, Akre, Mehabad, Sine, Şeqlawa.

BEŞA 6.
Dema xwendinê

## Li gorî agahiyên jorîn bersiva pirsên jêrîn bibînin.

**1.** Kî ji Diyarbekirê ye?
a) Mîrxan b) Zîwer Beg c) Rûken

**2.** Zîwer Beg, bi biraziyên xwe re li ser sifreya xwarinê dest bi çi kir?
a) Geşt b) Xwarin c) Suhbet

**3.** Em bi kurdî ji tûrîzmê re çi dibêjin?
a) Geştiyarî b) Geştiyar c) Geştûger

**4.** Zîwer Beg navê kîjan bajarî ji bîr kir?
a) Meletî b) Tetwan c) Diyarbekir



Riha

BEŞA 7.
Dema xwendinê

# Cihên geştûgerê-1

Mîrxan û Rûken bi agahiyên ku Zîwer Beg dan wan gelekî kêfxweş bûn. Lê mereqa wan jî zêdetir bû. Roja din bi hev re çûn ser bircên Diyarbekirê. Li wir Mîrxan ji mamê xwe pirsî:

-Mamo can, ji kerema xwe ji me re behsa cihên geştûgerê yên wan bajaran bike.

-De baş e. Em dê îro behsa hinek cihên geştûgerê bikin.

-Mamo can, vê carê ez dê binivîsim. Ji kerema xwe hêdî bibêje.

-Baş e berxê min. Bajar bi bajar hin cihên girîng ên geştûgerê ev in:




Şikeftên Hesûnî, Farqîn



Medreseya Şerefiye, Bedlîs


| | |
|---|---|
| **Li Diyarbekirê:** | Sûra Diyarbekirê, Çemê Dîcleyê, Pira Dehderî, Mizgefta Mezin, Dêra Meryemayê. |
| **Li Bazîdê:** | Qesra Îshaq Paşa û Gora Ehmedê Xanî. |
| **Li Bedlîsê:** | Keleha Bedlîsê, Medreseya Şerefiye, Gola Nemrûdê, Sîpanê Xelatê. |
| **Li Rihayê:** | Keleha Rihayê û Gola Masiyan. |
| **Li Cizîrê:** | Çemê Dîcleyê, Çiyayê Cûdî, Birca Belek, Gora Mem û Zînê, Medreseya Sor û Gora Nûh Pêxember. |
| **Li Farqînê:** | Mizgefta Selahedînê Eyûbî, Keleha Zembîlfiroş û Şikeftên Hesûnî. |



**BEŞA 8.**
Dema lîstikê

## Li gorî agahiyên jorîn li hemberî hevokên jêrîn nîşaneya “R” (rast) an “Ç”yê (çewt) daynin.

**1.** Gora Ehmedê Xanî li Diyarbekirê ye. ( )
**2.** Li Farqînê Mizgefta Selahedînê Eyûbî heye. ( )
**3.** Gola Masiyan li Cizîrê ye. ( )
**4.** Li Bedlîsê Gola Nemrûdê heye. ( )
**5.** Pira Dehderî li Diyarbekirê ye. ( )



**BEŞA 9.**
Dema lîstikê

## Navên bajar û cihên jêrîn hevyek bikin.

| | | |
|---|---|---|
| **1.** | Diyarbekir | Gola Masiyan |
| **2.** | Bazîd | Gora Mem û Zînê |
| **3.** | Bedlîs | Keleha Zembîlfiroş |
| **4.** | Riha | Gola Nemrûdê |
| **5.** | Cizîr | Qesra Îshaq Paşa |
| **6.** | Farqîn | Pira Dehderî |

BEŞA 10.
Dema xwendinê

# Cihên geştûgerê-3

Zîwer Beg, Mîrxan û Rûken birin ser Pira Dehderî. Ew bixwe ji bo bîna xwe vede, çû seyrangeha ber çem. Piştre Mîrxan û Rûken jî çûn cem wî û jê re gotin:

-Mamo can, hin cihên din ên geştûgerê jî hûn dikarin bibêjin?

Zîwer Beg got:

-Belê, hin cihên din jî ev in:

Keleha Amêdiyê, Perestgeha Laleşê, Keleha Akreyê, Keleha Hewlêrê, Aramgeha Helebçeyê, Gola Urmiyeyê, Herêma Hewramanê.

BEŞA 11.
Dema nivîsînê

Keleha Amêdiyê, Pira Dehderî, Mizgefta Mezin, Dêra Meryemayê, Keleha Hewlêrê, Qesra Îshaq Paşa, Gora Ehmedê Xanî, Keleha Bedlîsê, Medreseya Şerefiye, Gola Nemrûdê, Sîpanê Xelatê, Keleha Rihayê, Gola Masiyan, Birca Belek, Gora Mem û Zînê, Medreseya Sor, Gora Nûh Pêxember, Aramgeha Helebçeyê, Keleha Zembîlfiroş, Şikeftên Hesûnî, Perestgeha Laleşê, Keleha Akreyê, Herêma Hewramanê, Gola Urmiyeyê.

**Navên gol, keleh, gor û  medreseyên ku li jor derbas dibin binivîsin.**

**1.** Keleh: ..........................................................................................

**2.** Gor: ..........................................................................................

**3.** Medrese: ..........................................................................................

**4.** Gol: ..........................................................................................



**BEŞA 12.**
Dema xwendinê

## Çemên Ferat û Dîcleyê

Mîrxan û Rûken ji geşta xwe ya Diyarbekirê gelekî xweşhal bûn. Rojekê jî çûn Fîsqeyayê û Mizgefta Hezretî Silêman. Li wir dîtin ku Çemê Dîcleyê di bin Keleha Diyarbekirê re diherike. Dema vegeriyan malê ji mamê xwe pirsîn:

-Mamo can, tu dikarî ji me re hinekî behsa Çemê Dîcleyê bikî?

-Binêrin, delalên min. Li welatê me du çemên zehf girîng hene: Ferat û Dîcle. Ferat, çemê herî dirêj ê welatê me ye. Ev çem di axa Xarpêt, Meletî, Semsûr, Riha û Dîlokê re diherike. Dîcle jî di axa Pîran, Diyarbekir, Heskîf û Cizîrê re derbas dibe. Ji herêma navbera van her du çeman re Mezopotamya tê gotin. Li Mezopotamyayê gelek cihên dîrokî û geştiyarî hene. Lê bi taybetî ew bajarên ku Ferat û Dîcle di nav wan re derbas dibin gelekî xweş in.



**BEŞA 13.**
Dema axaftin û nivîsînê

## Hûn jî navên hinek çeman bibêjin û binivîsin.

**1.** ……………………………………………
2. ……………………………………………
3. ……………………………………………
4. ……………………………………………
5. ……………………………………………



BEŞA 14.
Dema axaftin û nivîsînê



## Hatûçûya Diyarbekirê

Mala Zîwer Beg li Peyasê ye. Devera Peyasê ji aliyê jîngeh û sîteyên nûjen ve gelekî pêşketî ye. Mîrxan û Rûken geşta xwe ya li Derê Çiya xilas kirin, li otobûsa nav bajêr siwar bûn û hatin mala Zîwer Beg. Lê ji ber ku Peyas ji Derê Çiya gelekî dûr e, Mîrxan û Rûken hinekî bi derengî gihîştin mala Zîwer Beg. Dema Zîwer Beg ew pêşwazî kirin Mîrxan got:

- Biborin Mamo can, em dereng man, me hûn dan sekinandin.


Zîwer Beg got:

-Na canê min, ne girîng e. Li Diyarbekirê hatûçû hinekî dijwar e. Ez dixwazim îro hûn nêrînên xwe yên li ser hatûçûya Diyarbekirê bibêjin.

Rûken: Mamo can, min di hatûçûya Diyarbekirê de gelek tiştên erênî dîtin. Wek nimûne tu wesayît di çiraya sor de derbas nabin. Di qadên çirayan de peyabor hene û rêwî li ser wan dimeşin. Wesayîtên komguhêz bênavber tên, rêwiyên xwe digirin û hereket dikin. Rêwî li rawestgehan zêde ranawestin. Di otobusê de ciwan cih didin kesên pîr û nîvîşkan.

Mîrxan: Mamo can, Rûkenê tiştên erênî gotin, bi destûra we ez jî dê tiştên neyînî bibêjim. Di hatûçûyê de dengên korneyan zêde hene. Wesayîtên komguhêz ên biçûk bi hev re dikevin nav pêşbaziyê. Di hatûçûyê de ev ne tiştekî rast e. Ji ber vê yekê gelek caran qeza çê dibin. Kêmasiyeke din jî ew e ku li nav bajêr riyên bisiklêtan nînin.

Zîwer Beg: Mîrxan tu rast dibêjî. Berê rewşa hatûçûyê xirabtir bû; ji Melîk Ehmedê heta Deriyê Rihayê mirov bi erebeyên hespan bar dikişandin. Lê Rûken jî rast dibêje. Îro di hatûçûyê de pêşveçûnên gelek mezin hene. Li taxên nû û derdora bajêr riyên gelekî rêkûpêk hatine çêkirin. Ez hêvî dikim ku kêmasiyên ku Mîrxan dibêje, dê ji holê rabin.



**BEŞA 15.**
Dema nivîsînê

## Bi bêjeyên tevlihev ên jêrîn, hevokên sererast çê bikin û binivîsin.

**1.** Zîwer Beg / ye / li / Mala / Peyasê

..............................................................................................................

**2.** ye / Peyasê / pêşketî / Devera / gelekî

..............................................................................................................

**3.** bi derengî / Mîrxan û Rûken / hinekî / Zîwer Beg / mala /gihîştin


..............................................................................................................

**4.** çiraya / Tu / di / sor / derbas / wesayît / de / nabin

..............................................................................................................

**5.** ranawestin / li / zêde / Rêwî / rawestgehan

..............................................................................................................



BEŞA 16.
Dema axaftin û nivîsînê

**Hûn jî 5 xalên erênî û neyînî yên hatûçûya bajarê xwe bibêjin û binivîsin.**

Xalên erênî:

**1.** ........................................................................................
**2.** ........................................................................................
**3.** ........................................................................................
**4.** ........................................................................................
**5.** ........................................................................................

Xalên neyînî:

**1.** ........................................................................................
**2.** ........................................................................................
**3.** ........................................................................................
**4.** ........................................................................................
**5.** ........................................................................................


# UNÎTEYA

# 7

## ÇALAKIYÊN SERBEST






***Mirov çi bike, bi xwe dike.***

**Gotina Pêşiyan**



**BEŞA 1.**
Dema axaftinê

*Zarokno, hûn dê di demên xwe yên serbest de çi bikin?* !


## Çalakiyên Serbest



**Loran**: Ez dê çîrokan bixwînim.




**Elind**: Ez jî dê ji bo çîrokan wêneyan çê bikim.



**Ferzan**: Ez jî dê wan wêneyan birengînim.




**Bengîn**: Ez jî dê wêneyan çarçove bikim.



**BEŞA 2.**
Dema nivîsînê

## Li gorî agahiyên jorîn, valahiyên jêrîn dagirin.

**1.** ………..… dê wêneyan birengîne.
**2.** Loran dê …………….. bixwîne.
**3.** …………dê wêneyan çarçove bike.
**4.** Elind dê ji bo çîrokan ………… çê bike




**BEŞA 3.**
Dema xwendin û axaftinê

## Zarokno, we di demên xwe yên serbest de çi kir?



**Tajdîn**: Min bi hevalên xwe re bi topê lîst.




**Gulistan**: Min li fîlman temaşe kir.




**Ristem**: Min alîkariya kesên mihtac kir.




**Elî**: Min di înternetê de malperên zarokan şopandin.



**Nêçîrvan**: Min bi hevalên xwe re bi kişikê lîst.




**BEŞA 4.**
Dema lîstikê


## Li gorî agahiyên jorîn, nav û wêneyên jêrîn hevyek bikin.

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| **1.** Gulistan | **2.** Ristem | **4.** Elî | **5.** Tajdîn | **6.** Nêçîrvan |









**BEŞA 5.**
**Dema xwendinê**

## Gotinên mezinan

*Heta tu dewr û dersan nekî tekrar û mesrûf*
*Di dinyayê tu nabî ne meşhûr û ne me'rûf*


**Ehmedê Xanî**

*Feyza me wekî Nîl e, lê em Dîcle û Ferat in.*

**Melayê Ciziri**



Turbeya Ehmedê Xanî, Bazîd



**BEŞA 6.**
Dema xwendin û axaftinê



**Çîçek**: Ez ji dapîra xwe guhdariya çîrokan dikim.




**Hişyar**: Ez û hevalên xwe ji hev mamikan dipirsin.

**Brûsk**: Ez ji bapîrê xwe zûgotinokan hîn dibim.






**Sînan**: Ez dersên xwe tekrar dikim.



**BEŞA 7.**
Dema nivîsînê

## Li gorî agahiyên jorîn, valahiyên jêrîn dagirin.

**1.** …………...hevalên xwe em ji hev……………dipirsin.
**2.** …………..dersên xwe ………..………………dike.
**3.** …………..ji bapîrê xwe ………………………hîn dibe.
**4.** …………  ji dapîra xwe çîrokan ……........…..dike.




## BEŞA 8.
Dema lîstikê




**1.** Mirov li sînemayê li filîman temaşe dikin.



**2.** Mirov li pêşangehan li wêneyan dinêrin.



**3.** Lîstikvan futbolê li stadyûman dilîzin.




**4.** Stranbêj li qada konserê distrin.



**5.** Şanoger li şanogehan dilîzin.




**6.** Canbaz li sîrkan hunerên xwe nîşan didin.



**7.** Li baxçeyê ajelan, gelek ajel dijîn.



**8.** Li lûnaparkê gelek lîstikên zarokan hene.







**BEŞA 9.**
Dema lîstikê

## Nav û wêneyên jêrîn hevyek bikin.

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Canbaz | Stranbêj | Şanoger | Fîlm | Resim | Futbol | Ajel | Lîstik |








**BEŞA 10.**
Dema xwendinê




Elind ji guhdarîkirina çîrokan gelekî hez dike. Rojekê ji bapîrê xwe pirsî, gelo şevşevok çima bi roj xuya nakin? Li ser vê yekê dapîra wê jê re çîroka şevşevokê û Silêman pêxember got:

## Şevşevok û Silêman Pêxember

Dibêjin gava Silêman pêxember Belqîs ji xwe re anîbû, Belqîsê jê xwest ku ji pûrta teyran jê re nivînekê çê bike. Silêman pêxember ferman da hemû teyran û got: "Divê hûn xwe birûçikînin da ku ji bo Belqîsê nivînekê çê bikin." Hingê şevşevokê xwe ranegirt zûka pûrta xwe rûçikand û çû. Lê teyrên din ew ferman ne rast dîtin û gotin: "Silêman pêxember, ma ne guneh e ku ji bona jina xwe me gişkan bidî rûçikandin? Em dê çawa zivistana xwe bê pûrt derbas bikin? Ev pûrt, canê me ji sermayê diparêze."

Silêman pêxember gotina wan rast dît û dev ji wan berda. Lê şevşevokê ku xwe rûçikandibû, ji wê rojê ve, şerm dike ku bi roj derkeve nav heval û hogiran, loma bi şev der tê.

**Osman Sebrî**
(Bi guhertinên biçûk)



**BEŞA 11.**
Dema axaftin û nivîsînê


## Serpêhatiya şevşevokê çi ye, bibêjin û binivîsin.

**BEŞA 12.**
Dema xwendinê



# Zarok û înternet


Îro li gelek malan înternet heye. Loma gelek zarok demên xwe yên serbest bi înternetê derbas dikin. Zarok înternetê ji bo armancên curbicur bi kar tînin. Înternet ji bo sipartekên xwendingehê gelek mifadar e. Lewra zarok gelek caran ji bo sipartekên xwe li ser înternetê lêkolînan dikin û agahiyên berfireh jê werdigirin. Yanî înternet îro ketiye şûna ansîklopediyên mezin. Ji vî aliyî ve bikaranîna înternetê gelekî baş e. Her wiha zarok ji bo ku dema xwe xweş derbas bikin jî înternetê bi kar tînin. Lê belê carinan zarok xwe ji bîr dikin û gelek demên xwe li ser gera înternetê derbas dikin. Ji vî aliyî ve jî bikaranîna înternetê gelek encamên nebaş derdixe holê. Loma divê zarok di bikaranîna înternetê de gelek hişyar bin û hemû demên xwe yên serbest li ser înternetê derbas nekin.



**BEŞA 13.**
Dema lîstikê

## Li gorî agahiyên jorîn li hemberî hevokên jêrîn nîşaneya “R” (rast) an “Ç”yê (çewt) daynin.

| | |
|---|---|
| Divê zarok hemû demên xwe yên serbest bi înternetê derbas bikin. | (    ) |
| Eger înternet baş bê bikaranîn ji bo zarokan gelek mifadar e. | (    ) |
| Gelek agahiyên ku di ansîklopediyan de hene, di înternetê de peyda dibin. | (    ) |
| Di bikaranîna înternetê de divê zarok gelekî hişyar bin. | (    ) |



**BEŞA 14.**
Dema mamikan

Tiştekî min heye,
Spî spî weke şîr,
Reş e reş e weke qîr,
Diçe diçe weke tîr,
Ev çi ye?
(qijik)


Ser textik e ne dar e,
Bin textik e ne dar e,
Çilo dixwe ne kar e,
Ev çi ye?
(kîso)

Xaniyekî pak û şûştî,
Bilbil tê de rûniştî,
Ev çi ye?
(çav)

Xaniyekî pak û şûştî,
Bilbil tê de rûniştî,
Ev çi ye?
(dev û ziman)

Cêwî ne, li kêlek in,
Ne goşt in, lê nermik in,
Dengan kom dikin,
Ev çi ye, de fêm bikin.
(guh)

Ji goşt û ji hestî ye,
Pênc şax û bi destî ye,
Sed û yek huner lê ye.
(dest û tilî)



**BEŞA 15.**
Dema lîstikê

## Mamikên jêrîn û wêneyan hevyek bikin, piştre navên wan binivîsin

Mamikê min ê mamanî,
Du paceyên bêderî,
Bişev girtî,
Biroj vekirî.


.....................

Ser textik e ne dar e,
Bin textik e ne dar e,
Çilo dixwe ne kar e.


.....................

Tiştekî min heye,
Spî spî weke şîr,
Reş e reş e weke qîr,
Diçe diçe weke tîr.

.....................







Xaniyekî pak û şûştî,
Bilbil tê de rûniştî,
Ev çi ye?

.....................

Ji goşt û ji hestî ye,
Pênc şax û bi destî ye,
Sed û yek huner lê ye.


.....................

Cêwî ne, li kêlek in,
Ne goşt in, lê nermik in,
Dengan kom dikin.

.....................









**BEŞA 16.**
Dema axaftin û nivîsînê

**Zarokno, hûn jî pênc mamikan bibêjin û piştre binivîsin.**

1…………………………………………………
……………………………………………………..
……………………………………………………..
……………………………………………………..

2…………………………………………………
……………………………………………………..
……………………………………………………..
……………………………………………………..

3…………………………………………………
……………………………………………………..
……………………………………………………..
……………………………………………………..

4…………………………………………………
……………………………………………………..
……………………………………………………..
……………………………………………………..

5…………………………………………………
……………………………………………………..
……………………………………………………..
……………………………………………………..

BEŞA 17.
Dema xwendinê



# Lîstikên me

**Zoncefer**

Zarok lîstika zonceferê bi xaran an bi gûzan dilîzin. Zoncefer di navbera du kesan de tê lîstin. Du kes berê wan bi hev de ne û yek ji wan li pişt xwe çend xaran di nav destê xwe de vedişêre û ji yê din dipirse: Ev zonc in an fer in? Kesê ku dibersivîne eger têderxe bê ka ew zonc in an fer in, xarên nav destê wî kar dike û dibin yên wî û dor derbasê wî dibe. Wê demê jî ew xaran dike nav destê xwe û dipirse. Lîstik bi vî awayî didome û dema ku xarên yekî biqedin lîstik jî bi dawî dibe.



**BEŞA 18.**
Dema axaftin û nivîsînê

## Zarokno, hûn jî lîstikekê vebêjin û piştre binivîsin.

# FERHENGOK

Acizkirin : Rahatsız etmek
Agahî : Bilgi
Agir :Ateş
Ajel : Hayvan
Alûc : Erik
Amadekarî : Hazırlık
Amadekirin : Hazırlamak
Aramgeh : Anıt
Av : Su
Avabûn : Kurulmak
Avahî : Bina, yapı
Avakirin : Kurmak, düzenlemek
Avêtin : Atmak
Awa : Çeşit, şekil
Bager : Fırtına
Bahoz : Kasırga
Bajar : Şehir
Balafir : Uçak
Balafirgeh : Havaalanı
Baldar : Dikkatli
Bapêşk : Tipi
Bapîr : Büyük baba
Bazdan : Koşmak
Bazirganî : Ticaret
Bêguman : Şüphesiz, kuşkusuz
Bêhal : Halsiz
Bêhnvedan : Dinlenme, teneffüs
Behskirin : Söz etmek, bahsetmek
Bênavber : Aralıksız
Bênder : Harman
Bendera keştiyan : Gemi limanı
Berê : Eski, geçmiş, önceki
Berêvar : Akşamüstü
Berî : Önce
Bername : Program
Bersiv : Cevap
Bêtir : Daha çok
Beybûn : Papatya
Bezîn : Koşmak

Bi baldarî : Dikkatlice
Bi cih bûn : Yerleşmek
Bi giştî : Genellikle
Bi hev re : Beraber
Bi piranî : Çoğunlukla
Bi taybetî : Özellikle
Biborin : Affedersiniz
Bijartin : Seçmek
Bikaranîn : Kullanmak
Bilêt : Bilet
Bilind : Yüksek
Bira : Erkek kardeş
Birazî : Yeğen (erkek kardeş tarafından)
Birc : Burç
Birêkûpêk : Düzenli
Birin : Götürmek
Birîn : Kesmek
Birûsk : Şimşek
Biryar : Karar
Buha : Ücret
Bûkik : Oyuncak bebek
Carek : Bir kez
Carinan : Bazen
Cîhan : Dünya, âlem
Cil û berg : Kılık kıyafet
Çav : Göz
Çawa : Nasıl
Çem : Nehir, dere
Çente : Çanta
Çinîn : Biçmek
Çîrok : Hikâye, masal
Çiya : Dağ
Çopdank : Çöp kutusu
Çûn : Gitmek
Daketin : İnmek, iniş
Danasîn : Tanıtmak
Dapîr : Nine
Dar : Ağaç

Dawî : Son
Debir : Ekin
Dem : Vakit, zaman
Demildest : Hemen, derhal
Dêr : Kilise
Derbasbûn : Geçmek
Derbaskirin : Geçirmek
Derdor : Çevre
Dereng : Geç
Derheqê : -ile ilgili
Derî : Kapı
Derketin : Çıkmak
Derman : İlaç
Ders dîtin : Ders okumak, ders almak
Dersa werzişê : Spor dersi
Derve : Dışarı
Derxistin : Çıkarmak
Derzî : İğne, aşı
Dest : El
Destpêkirin : Başlamak
Destûr : İzin, müsaade
Dibistan : İlkokul
Digel : Birlikte
Dikan : Dükkân
Dil : Gönül, kalp
Dilxweşî : Gönül hoşluğu, mutluluk
Dîmen : Manzara
Diran : Diş
Dirêj : Uzun
Dîrok : Tarih
Dîrokî : Tarihi
Dîsa : Yine
Dîwar : Duvar
Dor : 1. Çevre, etraf 2. Sıra
Eger : Eğer, şayet
Encam : Sonuç, netice
Erebeyên destan: El arabaları
Erênî : Olumlu
Erzan : Ucuz
Êşîn : Ağrımak, acımak
Êvar : Akşam
Fabrîqe : Fabrika
Fer : Tek
Firavîn : Öğle yemeği
Firçe kirin : Fırçalamak
Firîn : Uçuş
Fîrma : Firma
Firotin : Satmak
Fîş : Fiş
Gazîkirin : Çağırmak
Gelek : Çok
Gelo : Acaba
Genim : Buğday
Germ : Sıcak
Geşt : Gezi
Geştiyar : Turist
Geştiyarî : Turizm
Geştûger : Seyahat
Gihîştin : Yetişmek, varmak
Gilyaz : Kiraz
Girêdayî : Bağlı
Girîng : Önemli, mühim
Girtin : Tutmak, almak
Gor : Mezar
Goşt : Et
Guhdarîkirin : Dinlemek
Guhertin : Değiştirmek
Gund : Köy
Gundî : Köylü
Gupegup : Gümgüm
Gûz : Ceviz
Hatûçû : Trafik
Havîn : Yaz
Hawîrdor : Etraf, çevre
Haydar : Haberdar
Hebûn : Var olmak
Hêdî : Yavaş
Hêkerûn : Tavada yumurta
Hember : Karşı
Hemû : Hepsi
Hênik : Serin
Her yek : Her biri
Herêm : Bölge
Herikîn : Akmak, akış
Hêsanî : Kolaylık
Hesp : At
Heval û hogir : Arkadaşlar ve dostlar
Heval : Arkadaş
Hevok : Cümle
Hewa : Hava
Hewce : İhtiyaç, gereklilik
Hezkirin : Sevmek, hoşlanmak

Hilgirtin : Kaldırmak
Hişyar : Uyanık, dikkatli
Hol : Salon
Hundir : İçeri
Îsal : Bu yıl
Jêbir : Silgi
Jêhatî : Çalışkan
Ji ber ku : -den dolayı
Ji ber vê yekê : Bundan dolayı
Ji kerema xwe : Lütfen
Ji mêj ve : Eskiden beri
Ji niha pê de : Bundan sonra
Jibîrkirin : Unutmak
Jiholêrabûn : Ortadan kalkmak
Jin : Kadın
Jîn : Yaşamak
Jîngeh : Yaşam alanı, çevre
Jixewrabûn : Uyanmak
Jiyîn : Yaşamak
Jûr : Oda
Kade : Bir çeşit pide
Kalo : Dede
Kanî : Çeşme
Kar : İş
Karîn : Edebilmek, yapabilmek
Keç : Kız
Kêfxweşbûn : Memnun olmak, mutlu olmak
Keleh : Kale
Kelem : Lahana
Kelûpel : Araç-gereç
Kêm : Eksik
Kêmasî : Eksiklik
Kenîn : Gülmek
Kêr : Fayda
Kerî : Sürü
Kes : Kimse, kişi
Ketin : Düşmek
Kevin : Eski
Kirîn : Satın almak
Kîso : Kaplumbağa
Kişik : Satranç
Koçkirin : Göç etmek
Kolan : Sokak
Komguhêz : Toplu taşıma
Kuçe : Sokak
Kulîlk : Çiçek
Kurmîbûn : Çürümek
Kurt : Kısa
Lambe : Lamba, çıra
Laş : Vücut, beden
Lek bi lek : On binlerce
Lêkolîn : Araştırma
Lewma / loma : Dolayısıyla, bu nedenle
Lewra : Çünkü
Leyîstok : Oyun
Li gorî : -e göre
Lîstin : Oynamak
Lixwekirin : Giymek
Lod : Yığın
Mal : Ev
Malnişîn : Emekli
Malper : İnternet sitesi
Mam, ap : Amca
Mamik : Bilmece
Mamoste : Öğretmen
Masî : Balık
Mayîn : Kalmak
Medrese : Okul
Meh : Ay
Mêwe : Meyve
Mezin : Büyük
Miawin : Araç muavini
Miayene : Muayene
Mîkrob : Mikrop
Mirov : Şahıs, kişi
Mişar : Evlek, arık
Mişmiş : Kayısı
Mixabin : Maalesef
Mizgeft : Cami
Muzîk : Müzik
Nalîn : İnleme
Nasîn : Tanıtmak
Navend : Merkez
Naxwe : Yoksa, değilse
Necter : Sera
Nêrîn : Bakmak, Bakış
Nerm : Yumuşak
Newal : Vadi
Nexweşketin : Hastalanmak
Nexweşxane : Hastane
Neyînî : Olumsuz

| | |
|---|---|
| Neynokjêkirin | : Tırnak kesmek |
| Nêzîk | : Yakın |
| Nifûs | : Nüfus |
| Niha | : Şimdi |
| Nivîşkan | : Özürlü |
| Nîv | : Yarım |
| Nivîn | : Yatak |
| Nivîs | : Yazı |
| Nîvro | : Öğle |
| Nixaftin | : Örtmek |
| Nizm | : Alçak |
| Nû | : Yeni |
| Bijîşk | : Doktor |
| Nûjen | : Modern |
| Nûkirin | : Yenilemek |
| Paqij | : Temiz |
| Paqijî | : Temizlik |
| Paqijkirin | : Temizlemek |
| Parastin | : Korumak, savunmak |
| Paseport | : Pasaport |
| Pêjgeh | : Mutfak |
| Pêkanîn | : Yerine getirmek |
| Pêkhatin | : Meydana gelmek, oluşmak |
| Perestgeh | : Mabed, ibadethane |
| Pêşbazî | : Yarışma |
| Pêşkêşkirin | : Sunmak |
| Pêşketî | : Gelişmiş |
| Pêşveçûn | : Gelişmek, ilerlemek |
| Pêşwazîkirin | : Karşılamak |
| Pêwîst | : Gerekli |
| Pêxwarin | : Zeytin, peynir, reçel vb. ekmekle yenilen yiyecekler |
| Peyabor | : Yaya geçidi |
| Pez | : Küçükbaş hayvan, sürü |
| Piçûk | : Küçük |
| Pir | : Çok |
| Pir | : Köprü |
| Piranî | : Çoğunluk |
| Pirsgirêk | : Sorun, problem |
| Pirtûk | : Kitap |
| Pisîk | : Kedi |
| Pişt | : Arka |
| Pîvazterk | : Yeşil soğan |
| Pol | : Sınıf |
| Por | : Saç |
| Pûk | : Kar tipisi |
| Pûrt | : Tüy |
| Qedîn | : Bitmek, tamam olmak |
| Qesir | : Köşk |
| Qevdek | : Bir demet |
| Qeza | : Kaza |
| Qijik | : Karga |
| Qirêjkirin | : Kirletmek |
| Qirik | : Boğaz |
| Qîrîn | : Bağırma |
| Qirşûqal | : Çer çöp |
| Rabûn | : Kalkmak |
| Raketin | : Uyumak |
| Rasterast | : Doğrudan |
| Rawestan | : Durmak |
| Razan | : Uyumak, uzanmak |
| Refa pirtûkan | : Kitaplık |
| Rengandin | : Boyama |
| Rengîn | : Renkli |
| Reqas | : Oynayan, dans eden |
| Revîn | : Kaçmak, koşmak |
| Rêwî | : Yolcu |
| Rêzgirtin | : Saygı gösterme |
| Rêzik | : Kural |
| Rind | : Güzel |
| Rojnivîsk | : Günlük |
| Ronî | : Aydın |
| Rotar | : Rötar, uçağın gecikmesi |
| Rû | : Yüz |
| Rûbiken | : Güler yüzlü |
| Rûçikîn | : Yolmak |
| Sabûn | : Sabun |
| Sar | : Soğuk |
| Sedsal | : Yüzyıl |
| Sêlmî | : Bir çeşit tatlı |
| Serdem | : Dönem |
| Serê sibehê | : Sabahleyin |
| Sererast | : Düzgün |
| Serma | : Soğuk |
| Serpêhatî | : Hikâye, başından geçenler |
| Serşok | : Banyo |
| Serşuştin | : Banyo yapmak |
| Servîs | : Servis |
| Sêv | : Elma |
| Seyrangeh | : Piknik yeri |
| Sî | : Gölge |
| Sibe | : Yarın sabah |

Sipartek : Ödev
Siruşt : Doğa, tabiat
Siwarbûn : Binmek
Soz dan : Söz vermek
Spî : Beyaz
Stran : Şarkı
Stranbêj : Şarkıcı
Sûlav : Şelale
Swêd : İsveç
Şabûn : Sevinmek
Şanogeh : Tiyatro salonu
Şanoger : Tiyatrocu
Şareza : Bilgili
Şehkirin : Taramak
Şerm : Utanmak
Şermkirin : Utanmak
Şevşevok : Yarasa
Şikeft : Mağara
Şikînandin : Kırmak, parçalamak
Şîv : Akşam yemeği
Şivan : Çoban
Şivantî : Çobanlık
Şiverê : Patika, keçi yolu
Şiyarbûn : Uyanmak
Şûştin : Yıkamak
Taştê : Öğle yemeği.
Tayê diranan : Diş ipi
Tekrar kirin : Tekrarlamak
Temaşekirin : Seyretmek, bakmak
Tendurist : Sağlıklı
Tenduristî : Sağlık
Tenê : Sadece, yalnız
Tev : Hepsi, birlikte
Texte : Tahta
Teyrok : Dolu
Tîbûn : Susamak
Tîmarkirin : Kaşağılamak
Tiraktor : Traktör
Vegerîn : Dönmek
Vegotin : Açıklamak, anlatmak
Veguhestin : Aktarma
Vemirandin : Söndürmek, kapatmak
Veqetîn : Ayrılmak
Vexwarin : İçmek
Welat : Memleket, vatan
Wêne : Resim
Werimîn : Şişmek
Wesayît : Araç
Wiha : Böyle, şöyle
Xaçerê : Kavşak
Xanim : Hanim, eş
Xar : Misket, bilye
Xebitîn : Çalışmak
Xemgîn : Üzgün
Xemgînbûn : Üzülmek
Xemilîn : Süslenme
Xetên hewayê : Hava yolları
Xew : Uyku
Xêzkirin : Karalamak, çizmek
Xox : Şeftali
Xuyakirin : Görünmek
Xwarin : Yemek
Xwêdandayîn : Terlemek
Xwendekar : Öğrenci
Xwendin : Okumak
Xwestin : İstemek
Xweşhal : Mutlu
Xweşik : Hoş, güzel
Xwişk : Kız kardeş
Yekqat : Tek katlı
Zanîn : Bilmek
Zanîngeh : Üniversite
Zarok : Çocuk
Zêde : Fazla
Zêdetir : Daha fazla
Zevî : Tarla
Zîp : Dolu
Zîzbûn : Duygulanmak, içlenmek
Zonc : Çift
Zozan : Yayla
Zûgotinok : Tekerleme

# ÇIMEYÎ


- Cegerxwîn, Agir û Pirûsk, Weşanên Avesta, Stenbol: 2003
- D. Îzolî, Ferheng: Kurdî-Tirkî, Tirkî-Kurdî, Weşanên Deng, İstanbul: 2002
- Emîn Ebdulqadir, Hozan û Şanogeriya Zarokan di Edebî Kurdî de, Weşanxaneya Spîrêz, Hewlêr: 2007
- Emîr Celadet Bedir Xan&Roger Lescot, Kürtçe Dilbilgisi (Kurmancî), Weşanên Doz, İstanbul: 1991
- Gîwî Mukriyanî, Ferhengî Kurdistan, Enstîtuya Kurdî ya Amedê, Diyarbekir: 2004
- Grûba Xebate ya Vateyî, Rastnuştişê Kirmanckî (Zazakî), Îstanbul: 2005
- Hawar (1932-1945), Weşanên Nûdem, Stockholm: 1998
- Heciyê Cindî & Emînê Evdal, Folklora Kurmanca, Weşanên Avesta, Stenbol: 2008
- Kadri Yıldırım, Kürtçe Dilbilgisi (Kurmancî Lehçesi), MAÜ Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları, Mardin: 2012
- Kepîr, Duhok: 2010
- M. Mamîsanij & Mehmed Uzun & J.Îhsan Espar, Ferhengê Kirmanckî (Zazakî)-Tirkî, Weşanxaneyê Vateyî, Îstanbul: 2009
- Mîkaîl Bilbil & Bahoz Baran, Rêzimana Kurmancî, Weşanên Enstîtuya Amedê, Diyarbekir: 2008
- Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl, Mesele û Metelokên Gelê Kurd, Enstîtûta Kurdzaniyê, Wien: 2005
- Ramazan Pertev, Zarok û Çîrok (Destpêka Pedagojiya Kurdî), Weşanên Doz, Stenbol: 2008
- Ronahî (1942-1945), Kombenda Kawa Bo Çanda Kurdî, Erbîl: 2001
- Xwendina Kurdî Bo Pola Sisêya Bineretî, Hikumeta Herêma Kurdistana Iraqê: 2008
- Zana Farqînî, Ferhenga Kurdî-Tirkî, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol: 2005